

Bi hêviya vegera warên xwe

Dubare qalkirina êş û îşkence, êrîş, dagirkerî û hemû cureyên kiryarên dermirovî pir zehmet tê. Lê vegotina bûyeran hîn bareki girantir dide ser milên me. Jixwe gelek caran bûyerên heyî derbasî qeydên dîrokê nehatin kirin... ***Eylem Şoreş / R.2***

Herkesî ew ji malê nas dikir

Li pişta wan barê kurdayetiyê, weke kulekê, weke birînekê, di şeveke zivistanê de ew ji malan dan hevdû. Ew wê gavê hê 5 salî bû. Sal 1937 bû. Ew ji Nahçivanê rakirin û sirgûnî Kazakistanê kirin. Di nava şevekê de, gava... ***Îbrahîm Seydo Aydgan / R.5***

Wêjeya pazû û simbêlan

Ji bo wêjeya bisimbêl baş were famkirin û aşkerakirin em ê li ser du nivîskaran û du berhemên cuda rawestin. Romana Mehmed Uzun 'Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê' û Çîroka Firat Cewerî ya bi navê 'Kevoka Spî'... ***Elîf Gun / R.8***

xwebûn

6-12 ÎLON 2021 HEJMAR: 90 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Daristanên Kurdistanê naşewitin dişewitînin

17'ê tebaxê piştî tevgera leşkerî ya li herêma gundên Kûrûkaymak û Danzî yên girêdayî navçeya Xozat a Dersimê şewat derket. Dewleta tirk ya ku çavê xwe ji şawata daristanên bakurê Kurdistanê re digire nahêle şêniyên herêmê jî mudaxeleyî agir bikin. Ji ber ku di dema xwe de mudexaleyî şewatê nehat kirin agir li herêmê belav bû. Leşker bi derxistina van şewatan hewil dide encam bigire... ***Felemez Ulug / R.6***

Efrîniyan Efrîneke din ava kir

Efrîn di dema krîza Sûriyeyê û beriya dagirkirina wê de bûbû qibilgeha hemû sûriyeyîyên ku ji ber azarên şer û wêraniyê direvin. Bi deh hezaran sûriyeyiyan ji ber êrîşên li herêmên wan berê xwe dabûn kantona Efrînê. Şêniyên Efrînê û Rêveberiya wê ya Xweser ewil Sûriyeyî di nava ewlehî û aramiyê de pêşwazî kirin... ***Fewaz Reşo/ R.6***

Mexmûr û Şengal vîna azad in

Balafirên şer ên Tirkiyeyê di şeva 2'yê îlonê de gundê Barê yê Şengal û sibeha 3'ê îlonê jî Wargeha Mexmûrê bombe kirin. Li Mexmûr û Şengalê gel daket qadan û gotin: "Gelê Mexmûr û Şengalê tu carî serî netewand û dê netewîne" Endama TAJÊ Neam Bedel diyar kir ku wan heya niha serî ji êrîşên dewleta tirk re netewandiye û dê netewînin.'... ***R.3***

Di avakirinê de rolên zayendan

Her çiqas fenomenên 'netew' û 'netewebûn'ê mijarên nûjen – digel dîroka dirêj a mirovahiyê-bin jî, dema mirov nîqaş û gengeşiyên li derdora vê mijarê diqewimin binêre, dê bêje qey ev têgeh ji destpêka mirovahiyê ve, di nav nîqaşên me de ye û neguherbar, bêserî û bêdawî ye. Lê ligel temenê xwe yê kin ê nav dîroka mirovahiyê dîsa jî xwedî bandoreke mezin bûye û hin jî mohra xwe li gelek rojevên civakî, siyasî û zanistî dixe.Têgeha 'natio' (netew) ji destpêka dema antîk heta serdema navîn di wateya 'cihê lê tê zayîn' an jî 'cihê li ser tê jiyîn' hatiye bikaranîn. Wekî wateya wê ya îro ku em bibêjin bi taybetiyên wek 'ziman, etnîsîte, çanda hevpar û...

Munewer Azîzoglu / R.2

Armanc belavkirina girseya polîtîk e

Gelek taxên navçeya Sûrê hatin xerakirin û li şûna wan mîmariyek nû hat avakirin. Dîsa tê xwestin ku hin taxên navçeyên Yenîşehîr û Rezan bê xerakirin û li şûna wan mîmariyek nû ava bikin. Ji bo agahiyên der barê vê mijarê de, me hevdîtinek bi avahîsaz Şerefxan Aydin re kir. Endezyar Aydin anî ziman ku dewletê her tim gelê Sûrê wekî gefekê li hemberî xwe dibîne û wiha got: "Lewre jî li gorî wan ew cihekî ku diviyabû mudaxele lê were kirin û ev girse ji hev were belavkirin. Di encama destwerdana Sûrê de dewlet giha wê armanca xwe û ew girse parçe kirin. Dema dewlet behsa ewlehiyê dike ew ne ji bo van pirsgirêkên civakê... ***Hevpeyvîn / Rizoyê Xerzî / R.4***

Kî Tevgera Talîbanê xwedî dike

Tê texmînkirin ku tevgera Talîbanê yek ji tevgerên çekdar ên cîhanê ya herî zengîn e. Piştî 20 salan ji şer û pevçûnên dijwar ên bi hêzên DYA û hevkarên wê re Talîbanê çawa dikaribû xwe fînanse bike û ewqas lêçûnên şer û endamên tevgerê ji ku peyda dikirin? Talîbanê di navbera salên 1996 û 2001'ê de desthilatdariya Afganistanê kiribû, piştî destwerdana hêzên navneteweyî û şerê 20 salan tevgera Talîbanê hem bi hejmara xwe û hem bi hebûnên di destê xwe de mezintir bû. Niha di navbera 70 heta 100 hezar endamên vê tevgerê hene ku berî destwerdana DYA û hêzên hevpeymanê hejmara wan derdora 30 hezar çekdarî bû... ***R.7***

Xanzad: Yekem Koma Jinan a Rokê

Sozdar Koçer / R.11

Bûka mala me

Heta niha me çend bûk anîne, hemû jî weke xanima li ber mala xwe û halê xwe sekinîne, ji xwe re mal ava kirine, zarokên xwe dane xwendinê û mezin kirine. Ya herî baş jî malên xwe fireh û mezin kirine. Ji xwe re cîranên baş hilbijartine, xwe bi hemû kesan dane hezkirinê.Lê bûka mala me ji gundê çiyayî hatî ye, ew li gundekî di nava çiyayan de mezin bûye, li wî gundê ku ew lê mezin bûye, tenê tu dikarî li ser pişta hespan an jî li ser pişta keran biçî wir... ***Kewê Redkan / R.10***

Bihuşta Çermûgê: Şirava Şêxan

Kurdistan bi taybet ji hêla xwezayê ve xweş e. Hûn berê xwe bidin kijan alî dê xweşikbûneke xwezayî derbikeve pêşberî we. Her yekê wan ji hevdu xweşiktir ji hevdu taybetir in... ***Serdar Altan / R.12***

Tarixê kurdan rê dismenî

Dismenîya vera şarê kurdî de xoza zî hedef girîyena. Faşîzmî ra kemer û kuç, dar û ber, teyrudur kî para xo gênî. Nê çemî azad herikîyenê, nê kî darî benê gewe, nê kî mircikê sey zerya xo wanenê. Dismenîya dewlete înan sero ra xo eskera kena. Welatê ma, hardo ke kamayîsê ma vejîyo werte, hardo ke pîlema tey weşîya xo ramite werte adir de ro. Zorvajîya henena bi serranê peynîya xo nîna. Însanan qir kerdî, estê zerrê, bi hezaran kerdê muxacîr û onca kî nêvindene. Îqtîdarê AKPyî bi polîtîkayanê lej û rantî, xozaya Kurdîstanî kena xan û xirabe. Eynî waxtî de ciwîyayîşê şarî, kultur û vîrra qom yena hedef girewtene. Bi plananê lejî kurdî hardê xo ra benê. Pêro tarîxê şaranê ke Mezopotamya de ciwîyenê, wazenê rêca înan hard serd de nêmano... ***Meral Ozel / R.9***

Bi hêviya vegera warên xwe

Eylem Şoreş

Dubare qalkirina êş û îşkence, êrîş, dagirkerî û hemû cureyên kiryarên dermirovî pir zehmet tê. Lê vegotina van bûyeran hîn barek girantir dide ser milên me. Jixwe gelek caran bûyerên heyî derbasî qeydên dîrokê nehatine kirin. Ji bo vê jî divê hîn zêdetir hemû hovîtiya desthilatdaran û çeteyên wan were vegotin. Yek ji mijarên me yên di wan demên dawî de jî kiryarên li Efrîna dagirkirî ne. Sala 2018'an Efrîna rengîn piştî berxwedana 58 rojan a gel û şervanan ji aliyê dewleta tirk û komên girêdayî wê ve hat dagirkirin. Îro piştî zêdeyî 3'ê salan dîmenên ji bajêr dihêlin ku fikira 'Gelo ev der Tirkiye ye?' bê bîra mirovan. Ji bajarê ku berê weke wargeha aramiyê dihat nasîn êdî tiştek xuya nake. Efrîn bi destê komên girêdayî Tirkiyeyê veguherî bajarê hemû tiştên xirab.

Çeteyan ev 3 sal in li wir efrîniyan direvînin, bi taybet jinên Efrînê. Îşkence li pitikan dikin û di hovîtiyê de tu sînoran nas nakin. Dîmenên pitikên ku çeteyan li wan dan herkesî dît lê êdî gotin 'Li ber çavên cîhanê' jî bê mane dimîne. Em hemû dizanin ger hêzên cîhanê nexwestibûna Kurdistan nedibû qada şer. Lê fikira 'Bila li welatê me nebe, bila li Rojhilata Navîn be' rê vedike ku her tim axa me bibe qada şer.

Çavkaniya çeteyan; fîdye

Lê bêyî ku ji kiryarên li Efrînê dûr bikevim niha bûyera herî dawî li navçeya Efrînê Racoyê bi bîr bînim. Komên bi navê polîsên leşkerî Muhamed El-Fatih û El-Muntasir Billah 2 jinên ciwan ên ji gundê Badînayê revandin. Hêvîn Abdîn Xerîbo hîn 20 salî ye û Lîna Zekeriya Îbîş jî 22 salî ye. Çeteyan ku canê mirovan ji xwe re kirine çavkaniya xwebihêzkirina fîdye ji malbatan xwestin û li beramberî 2 hezar dolarî Hevîn Abdîn berdan. Lîna Îbîş jî hewl dide xwe xilas bike û gule li ser wê tên reşandin. Li gundê Badînayê tê revandin.

Ji sedî 15 welatiyên kurd mane

Di du mehên dawî de bûyerên bi vî awayî gelek zêde bûne. Piştî dagirkirina Efrînê bi hezaran welatî koç kirin lê malbatên ku vegeriyan jî hene. Lê efrîniyên ku vedigerin jî bi îşkenceyên komên girêdayî Tirkiyeyê re rûbirû dimînin. Li Efrînê êdî tenê ji sedî 15 welatiyên kurd mane. Bi taybet jinên kurd li wir tên hedefgirtin. Weke li her derê li wir jî hedefa yekem jin in. Komên girêdayî Tirkiyeyê jinan qetil û tecawîz dikin û bi vê rêyê serweriya xwe li Efrînê didomînin. Di meha tîrmehê de 37 û di tebaxê de jî 42 kesên ku 5 jê jin in hatin revandin. Heya niha jî ji jinên hatin revandin tenê 2 serbest hatin berdan. Di 11'ê tebaxê de çeteyên Firqeya Sultan Murad gundê Qirtqilaqê yê navçeya Şerayê dorpêç kiribû û piştî ku telefonên gundiyan ji wan stendin, bi ser malên wan de girtibûn û zêdetirî 30 gundî, di nav de jin û zarok revandibûn.

Xaleke din jî ew e ku jinên li Efrînê neçarî xwekuştinê tên hiştin. Ev jî yekser dikare weke qetilkirinê bê binavkirin. Yek ji wan jinan jî Ayşe Mihemed Xalid a 20 salî bû. Ayşe di 13'ê tebaxê de dawî li jiyana xwe anî. Ew ji gundê Basûtê yê girêdayî navçeya Şêrawa bû û dayika zarokekê bû. Hat gotin ku Ayşe Xalid ji ber zordariya artêşa tirk û komên girêdayî wê û tengavkirina welatiyan xwe kuştiye.

Heta niha 8 hezar kes revandine

27'ê tebaxê jî koma Ceyş El-Nuxbe yên girêdayî dewleta tirk li gundên Şêxûtka û Amara yên navçeya Mabatayê gelek kes revandin. Çeteyan ji malbatên kesên revandî hezar dolar fîdye xwestiye da ku wan serbest berdin.

Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan a Sûriyeyê li Efrînê ji roja ku hat dagirkirin heta niha nêzî 8 hezar kes hatin revandin û çarenûsa zêdeyî 3 hezar ji wan jî ne diyar e. Bi dehan welatiyên Sûriyeyê jî hatin revandin û li Tirkiyeyê bi girtîgehê hatin cezakirin. 30'yê tebaxê bûyerek bi vî awayî çêbûbû. Komên ku xwe weke 'polîsên leşkerî' bi nav dikin ji malbeteke ji gundê Celemê çar kes revandine. Di nava wan de keçek jî heye. Piştî endamên malbatê revandin jî wan radestî MÎT'a tirk ya li Efrînê kirin... Ev çend ji bûyerên ku li Efrînê tên jiyîn bûn.

Dê jin rojên tarî li pey xwe bihêlin

Planên dewleta tirk ên têkildarî Efrînê ji destpêkê ve diyar bûn lê weke li aliyên din, li wir jî xuya dibe dagirker li ku bikevin tengaviyê li wê derê êrîşên xwe zêde dikin. Wê li wir jî bi domdarî nikaribin xwe li ser pêyan bigirin.

Herî dawî jî dixwazim balê bikişînim ser çalakiyên efrîniyan. Em rojane çalakiyên bi bangên ji saziyên mafên mirovan dişopînin lê xuya ye ku saziyên navneteweyî û mafên mirovan û hwd. tenê ji bo çend civakan dixebitin. Lê dema roja guhertinê hat ew ên ku heya niha çavên xwe li hemberî êrîşan girtin li xwe vegerin an na..? Gelên Efrînê zêdeyî 3'ê salan bi hêviyên roja vegerin di koçberiyê de dijîn. Wê ew jî dema wextê wê hat bikaribin vegerin warên xwe û jiyana xwe ya di nava aramiyê de ji nû ve ava bikin. Dê jin jî wan rojên tarî li pey xwe bihêlin û bi xurtkirina rêxistiniya xwe, weke her tim pêşengtiya wê yekê bikin.

Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

Di pêvajoya avakirina netewebûnê de rolên zayendan

Her çiqas fenomenên 'netew' û 'netewbûn'ê mijarên nûjen –digel dîroka dirêj a mirovahiyê- bin jî, dema mirov nîqaş û gengeşiyên li derdora vê mijarê diqewimin binêre, dê bêje qey ev têgeh ji destpêka mirovahiyê ve, di nav nîqaşên me de ye û neguherbar, bêserî û bêdawî ye. Lê ligel temenê xwe yê kin ê nav dîroka mirovahiyê dîsa jî xwedî bandoreke mezin bûye û hîn jî mohra xwe li gelek rojevên civakî, siyasî û zanistî dixe.

Têgeha 'natio' (netew) ji destpêka dema antîk heta serdema navîn di wateya 'cihê lê tê zayîn' an jî 'cihê li ser tê jiyîn' hatiye bikaranîn. Wekî wateya wê ya îro ku em bibêjin bi taybetiyên wek 'ziman, etnîsîte, çanda hevpar û hwd.' tê nasîn, di wate û naveroka wê ya destpêkê de tune bûye. Hêdî hêdî ber bi avakirina 'netew' û 'netewdewletiyê' ve civakeke ku tê fikirîn û xeyalkirin cihê 'natio'yê, ango 'cihê lê tê zayînê' digire. Êdî mirov û civak li ser esasê 'aîdî' û 'neaîdî' tên pênasekirin. Gotina bi nav û deng a Massimo d'Azeglio ku dibêje 'Me Îtalyayê ava kir (çêkir), niha jî divê em îtalyanan ava bikin (çêbikin)' pêvajoya avakirina netewbûnê bi awayekî vekirî radixîne pêş çavên me. Ligel ewqas şer û qiyametên ku li ser vê fenomenê diqewimin teza ku dibêje 'netew fenomeneke avakirî ye' kêm zêde di nav zanistên civakî de rûniştiye. Lê ez ê vê tezê li vê kin bibirim û balê bikişînim ser di pêvajoyên netewbûnê de rola jinan. Lê ew ê ev mijar jî xwe bispêre ser vê tezê û ez ê giraniyê bidim ser 'avakirina rola jinan'.

Li dijî lêkolînên kevin ên der barê neteweyî/netewperestiyê ku digotin jin wek aktorên dîrokî ji pêvajoyên netewebûnê hatine qutkirin, lêkolînên nûjen di projeya avakirina netewebûnê de balê dikişînin ser rola jinan. Li gorî lêkolînên berê jin di pêvajoyên netewebûnê de wek parastvanên nirxên neteweyî û girêdayî vê wek perwerdekarên nifşên nû dihatin dîtin. Li gorî van lêkolînan dihat gotin, jin di pêvajoyên neteweyî de, taybetî bi rola dayîktiyê, wek amûr hatine bikaranîn. Lê lêkolînên nû, bêyî ku vê tespîtê piştçav bikin, rola jinan ji nû ve şîrove dikin. Li gorî vê tê gotin ku netewebûn ji bingehê ve li ser esasa zayendperestiyê hatiye avakirin. Ango ne ku jin di pêvajoya netewebûnê de li malê hatine qefilkirin û derî li ser wan hatiye girtin, li dijî vê bi taybetî mal ji bo avakirina neteweyê ji nû ve hatiye sererastkirin. Ji destpêkê ve mêr û jin di vê projeyê de bi rol û peywîrên cuda ji hev hatine dabeşkirin û her wiha li ser vê esasê war û nasnameyên cuda ku di heman demê de girêdayî hevdû ne, li wan hatine birîn. Lewma jî wekî ku lêkolînên berê îdîa dikin ku jin ji pêvajoyên netewebûnê hatine dûrxistin, ne rast e. Bîlaqîs rolên cuda û pêwendîdar li jin û mêran hatine birîn.

Wekî ku lêkolînên kevin jî binxêz dikin, rola jinan bi giranî girêdayî berpirsiyariyên wan ên malê û bi dayîkbûnê ve tê pênasekirin. Ango yên ku ji bo neteweyê siyaset û şer dimeşîne mêr e; ligel vê ya ku nirxên netewebûnê yên wek 'ziman, çand, nifş, malbat'ê biparêze, ji nû ve ava bike, bigihîne nifşên nû jin in. Ev rol û peywir girêdayî hevdû ne û yek nîn be, wateya ya din jî nîn e. Di ser de ku mirov tevlêbûna jinan a peywîra qada vekirî (şer û siyaset) bigire pêş çav, ev têkilî hîn diyarde, tevlihev û girêdayî hevdû derdikeve pêş. Ya ku bi vê tespîtê dixwaze bê gotin ev e: Ger em netewebûnê wek projeyeke avakirinê binav bikin; di vê projeyê de rol û peywirên jin û mêran jî ji hev cuda û bi pêwendî hatine avakirin. Ger em vê dabeşkirina peywiran ku di vê pêvajoyê de jinan wek piştgira mêran pênase dike û bi her awayî zayendperest e, rexne bikin jî, hîn jî di nav civaka me de ev bawerî rûniştiye. Hîn jî jin wek parastvanên nirxên neteweyî tên dîtin û li ser vê pejirandinê tên pîrozkirin an jî mehkûmkirin.

Ger em dîrokê wek bûyerên tên şîrovekirin û bi şîrovekirinê ji nû ve tê avakirin bigirin dest, em ê rol û peywirên ku li jin û mêran –bi giştî li zayendan- hatine birîn çawa şîrove bikin, da ku em karibin xwe ji vê xeleka zayendperest xelas bikin? Bi giranî bûyera ku derbê li vê şîroveyê dixe, tevlêbûna jinan a qada giştî ye. Jin êdî ne tenê li malê ne, li her deverî ne. Û mijara 'parastinê' êdî tenê girêdayî qada taybet e. Ev rastî hem ji hêlekê ve rola pasîf ku li jinan hatiye birîn çeprast dike; li hêla din jin qada vekirî ku bi mêran ve hatiye dorpêçkirin, dagir dike. Ji vir pê de em dikarin pênaseyên nû ava bikin. Madem jin parastvanên hin nirxan in, wê demê em ê bi xwe pênase bikin, ka em çi nirx diparêzin û çi na. Di vê çarçoveyê de yek mijar jî 'avakirina yekitiya neteweyî' ye. Nivîsa bê ez ê li ser bisekinim.

Mizgîn Ronak

Mijokdarî

Mijokdarî hukmê xwe yê nebixêr bi her awayî didomîne. Her wiha mirov dibîne ku teoriyên li ser mijokdariyê êdî kevin bûne têra îro nakin. Mînak; Sartre mijokdariyê wekî 'êrîş û hukmek leşkerî' bi nav dike û dibêje: "Ew hukmê leşkerî encax paşê dikare bi hukmê leşkerî bê tunekirin." Jixwe Cezayîra ku wekî gelek welatan li bin tankên welatê wî Fransayê bû jî vê yekê kir û xwe rizgar kir ji hêla leşkerî ve, dagirkerên Fransayê jî vekişiyan welatê xwe. Belam Cezayîr her bindest ma! Lewre mijokdarî tenê leşkerî nebû, wekî jehriya marê kor gihîştibû her şaneya wê ku heta îro jî nehatiye ser hemdê xwe.

Lê! Ez ê li vir bisekinim; lew em kurd bi taybetî jî yên Bakur, pispor û profên mijokdariyê ne. Lew gur, beraz, çeqel, kurm û hirçên wê yên herî dirinde li ber çavên me, di jiyana me de ne. Ewqas ked û berxwedan jî jixwe li hemberî wê pêk tê lê dixwazim bala me bikşînim ser xalekê; mijokdarî mirov dişibîne xwe! Tevî ku di navbeynê de Çiyayê Qafê jî heye kirasên xwe yên derûnî yên qirêj û pîs li mirov dike. Bêyî ku haya te jê hebe tu dibî 'ew!' Mînaka herî sosret ziman e! Dibe 'şildim bildima' te (hezar rehmet li wan dapîr û bapîrên kurdî be! Gelo gotina 'şildim-bildim' ji ku dîtine?) Çav diçin cihekî, guh li derek ecêb dimînin, bêvil nizanim xwe dirêjê ku derê dike.

Lê mijara me ziman e. Giyan e! Mijokdar welê dikin ku tu nikarî bi tu awayî wateya 'azadî û wekheviyê' fêm bikî. Ji bo fêm nakî hîs jî nakî, najiyî jî. Lew di çavên te de her tişt tenê du reng e, du tişt e, du tîp e. Serdest an jî bindest! Temam, mijokdar te hepsî nav zindana bindestiyê kiriye, jixwe tu bindest î! Lê xweliya serdestiyê jî li te bariyaye. Loma jî tu hem di pêwendiya bi xwe re hem jî bi yên din re nikarî bê qereqol, bê fermandar û bê serferman bimînî. (Ji ber vê yekê ye ku li Cezayîrê tu qereqolek mijokdaran nema lê ji ber qereqolên hundirîn, welat nikare rizgar bibe) îla gere yek bêje, yek guhdarî bike, yek biqîre, yek bêdeng be, yek dîktator be, yek jî kole. Ji lewre kes û civakên mêtingeh bê huzûr in, bê bawerî û pergal in.

Lewre diyar nîn e dê qereqol kînga biavêje ser jiyana wan, mayîn kînga biteqin. Ev bê ewlehî tev li xwîna wan bûye û bi coşek wisa digere ku hem serdestiyê hem jî bindestiyê di heman damarê de xurtir dike. Ka em li civatên xwe yên malbatî û hevaltî binêrin; a ku di wan de diçirise azadî û wekhevî ye yan projektorên nizanim kê ne. Loma jî lazim e em vê rewşa kambax bibînin, projektoran vemirînin û xwe bigihînin roniya stêrkên azadî û wekheviyê. Pirs; gelo em ji azadî û wekheviyê ditirsin? (Jixwe li ser 'tirsa ji azadiyê, azadbûnê' jî gelek lêkolîn û teorî hene.) Mesela em dibêjin ku serdestî yan jî jêrdestiyên me yên makro û mîkro tune bibin, em ê tût û rût li holê bimînin dê ne hezkirin bimîne ne jî hurmet bimîne? Na! Tenê ev gotina makyavel jî bes e: "Ji bo ku hûn hukumdar in kes ji we hez nake loma jî divê hûn wan bitirsînin." Jixwe zordestiya her cureyî jî li ser pişta tirsê dimeşî ne? Loma jî wiha diguhere û pirsek; qey em ditirsin ku em tirsa xwe winda bikin? Li vir disekinim û gotinek Seneca ya ku duh hîn bûm dinivîsînim: "Quî nîlpotest sperare, desperet nihil" (Medea) "kî bêhêvî be nikare hêviya xwe ji tu tiştî bibire" (min bi taybetî wiha wergerand da ku şibîna Quî-ki-ya latînî û ya me bînim ber hev) an jî bêhêvîtî, hêvîtî ye. Jixwe mirov kîjan gotinê tev dide, ji binî gelek tişt derdikevin. Loma jî hersê gotinên ku min bi wan dest pê kir –mijokdarî-serdestî-bindestî- niha li ber şewq û şemala bagera dil û hişê me bêwate û bêbandor in. Bila tim jî wiha bin!

‘Gel tu carî serî natewîne’

Balafirên şer ên Tirkiyeyê di şeva 2’yê îlonê de gundê Barê yê Şengal û sibeha 3’ê îlonê jî Wargeha Mexmûrê bombe kirin. Li Mexmûr û Şengalê gel daket qadan û gotin: “Gelê Mexmûr û Şengalê tu carî serî netewand û dê netewîne”

Navenda Nûçeyan

Balafirên tirk şeva 2’yê îlonê gundê Barê yê Şengalê bombe kirin. Di encama bombebaranê de kesek birîndar bû. Piştî êrîşê demek dirêj balafir bênavber li ser herêmê firîn, ji ber vê xelkê Şengalê dereng çûn cihê bûyerê. Piştî êrîşê şandeyek ji hêzên artêşa Iraqê yên li Şengalê serdana cihê êrîşê kirin, dîmen û wêneyên parçeyên roketa ku hatiye avêtin kişandin. Bêyî ku daxuyaniyê bidin vegeriyan. Piştî çûyîna balafiran, xelkê Şengalê li gel nûnerên xwe çûn gundê Barê û birîndar rakirin nexweşxaneyê. Gel û nûnerên saziyan li cihê bûyerê daxuyanî dan û diyar kirin ku dê têkoşîna xwe bi israr bidomînin. Endama TAJÊ Neam Bedel daxuyanî da û diyar kir ku wan heya niha serî ji êrîşên dewleta tirk û hevalbendên wê re netewandiye û wê ji niha û şûn de jî netewînin. Girseyê dirûşmeya ‘Bijî Berxwedana Şengalê’ berz kir.

Em ê li ber xwe bidin

Balafirên şer ên Tirkiyeyê serê sibeha 3’ê îlonê Wargeha Şehît Rustem Cûdî ya Mexmûrê bombe kir. Piştî êrîşê şêniyên wargehê berê xwe dan cihê bûyerê û li qadê helwesta xwe nîşan dan. Endamê Meclîsa Gel Elî Urek li vir daxuyaniyek da û Tirkiye û kesên destê wan di êrişan de hene şermezar kir. Urek bi bîr xist ku danê sibehê balafirên şer ên Tirkiyeyê êrîşî wargeha Mexmûrê kir û wiha got: "Di êrîşê de tu kes birîndar nebûn û nemirin. Armanca esasî ya dewleta tirk wargeha me ya sivîl a Mexmûrê ye. Ev hefteyeke li ser esmanên wargeha me, balafirên keşfê yên bêmirov û biçek-bêçek (SÎHA-ÎHA) bênavber difirin. Çima Iraq û hêzên hevpeyman ên ji esmanê herêmê berpirs vê nabînin û li ber vê tiştekî nakin. Dema em li rewşê dinêrin, bêdengî û hevkariyek heye. Armanca van êrişan aliyek tasfiyekirina Tevgera Azadiya Kurd û li aliyê din jî gelê kurd û welatparêzan ji doza wan kirine. Bi êrîşa li ser wargehê re armanc belavkirina gel e. Dewleta tirk dixwaze êrîşên xwe yên dema DAÎŞ’ê li Mexmûr û Şengalê nîvço mayî bi rengên din bidomîne. Dema ku gundê Şengalê bombe kirin, me zanî ku wê li me jî bidin. Em bang li hemû cihên peywendîdar dikin ku bi erkên xwe rabin. Em bang li gelê kurd dikin ku xwedî li rûmeta xwe derkevin. Gelê Mexmûrê me bi berxwedanê destpê kiriye, em ê li ber xwe bidin. Daxuyanî bi dirûşma ‘Bê Serok Jiyan Nabe’ û ‘Berxwedan Jiyan e’ dawî bû.

Cewher xera dikin

Bi hinceta ‘qada xetere’ tê xwestin ku Taxa Fîskaya û Ferîtkoşkê bên xerakirin. Welatiyan diyar kir ku dê nehêlin taxên wan bên xerakirin û nûnerên rêxistinên civaka sivîl jî anîn ziman ku armanc guherandina sosyolojiya bajêr e. Rayedarên hikumetê armanc dikin ku taxa Fîskayayê bi navê dîtir Dîcle û taxa Ferîtkoşk ên navçeya Yenîşehîr a Amedê xera bikin. Ev taxên ku nêzî 10 hezar kes lê dimînin di 18'ê tebaxa 2017'an de bi îmzeya Serokomar Tayyîp Erdogan wekî ‘qada xetere’ hatin îlankirin. Rayedar armanc dikin ku avahiyên her du taxan xera bikin û li şûna wan tiştekî din ava bikin. Şêniya Fîskayayê Salîha Kiliç anî ziman ku xaniyê wan ê 4 qatî ne bi buhayê daîreyekê ye û wiha got: "Kirêyên li vir li gor ên nava bajêr ne biha ne. Tim dixwazin van deran xera bikin.” ***AMED***

PDK’ê Cîhad Hesen şand girtîgehê

Li bajarê Hewlêrê yê Herêma Federe ya Kurdistanê, hêzên PDK’ê roja 10’ê Hezîranê, Nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê Hewlêrê Cîhad Hesen revandibûn. Piştî 82 rojan nû agahî ji Hesen hat girtin. Berdevkê Têkiliyên Derve yê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Kemal Akîf der barê rewşa Nûnerê xwe yê Hewlêrê Cîhad Hesen de daxuyanî da .Akîf diyar kir ku Hesen di girtîgehên PDK’ê de tê girtin û rewşa tendirustiya wî ne başe. Kemal Akif bang li rêxistinên hiqûqî kir ku bilez mudexale bikin û çarenûsa nûnerê wan li Başûr nas bike û derfetê bide ku malbat û parêzer serdana wî bikin. PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ê li Hewlêrê Cîhad Hesen tevî 2 endamên Komîteya Têkiliyan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PDK) di 10`ê Hezîranê de dema diçûn balafirgeha Hewlêrê, revandin. Di 29`ê Tîrmehê de PDK`ê her du endamên PYD`ê piştî 50 rojî serbest berdabûn. ***QAMIŞLO***

Leşkeran li Efrînê 196 kes revandin

Endama Kongra Star a Kantona Efrînê Şirîn Hesen diyar kir ku leşkerên Tirkiyeyê û komên girêdayî wê di meha tebaxê de 196 kes revandin. Di nava kesên hatine revandin de 15 jin hene. Şirîn Hesen agahî dan Rojnewsê û anî ziman ku leşkerên tirk û komên girêdayî wan êrîşê 35 malbatan kiriye. Şirîn Hesen bi bîr xist ku li Kantona Efrînê beriya kontrola dewleta tirk bi pêşengiya jinan pergalek demokratîk hatibû avakirin, lê dewleta tirk ev yek ji bo xwe wekî tehdîtekê dîtiye, lewma êrîş pêk anîye. ***EFRÎN***

Di tebaxê de 5 kolber kuştin

Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KMMK) rapora xwe ya têkildarî binpêkirinên mafan ên li herêmên kurdan ên Iranê di meha Tebaxê de hatine jiyîn li ser malpera xwe weşand. Komeleyê destnîşan kir ku li bajarên kurdan ên Rojhilat, 6 kes bi hinceta ‘Tiryakê’ hatin darvekirin û wiha got: “Rejima Îranê, bi awayekî bêhiqûq 48 kes girtin. Di meha tebaxê de, herî kêm 5 kolber hatin qetilkirin û 36 kolber birîndar bûn.” ***AMED***

Sûcên JÎTEM’ê tên nixumandin

Navenda Nûçeyan

JÎTEM a li dijî tevgera azadiya kurdan hat avakirin, bi hezaran mirovan revand, di binçavan de qetil kir, gund şewitand û înfazên bêdaraz kirin. Albayê teqawît Arîf Dogan jî li dijî Têkoşîna Azadiya Kurd di 1987’an de JÎTEM ava kir. Serfermandarê Artêşê yê berê Dogan Gureş û damezirînerê JÎTEM’ê Arîf Dogan ên li Kurdistanê berpirsyarê gelek sûcan bûn, hesabên wan sûcan nedan û mirin. Li Kurdistanê bi taybetî di salên 90’î de wekî polîtîtikaya dewletê gelek qetlîam, cînayet, kuştinên kiryar nediyar, îşkence, şewitandina gundan, koçberiya bi zorê kete meriyete. Berpirsyarên van kirinan ligel daxwaz û serlêdanan nehatin darizandin. Doz li berpirsiyaran hat vekirin, lê ser van dozan yek bi yek hatin girtin. Heta niha ser dozên wek Doza Qizilxaçê, Doza JÎTEM’ê ya Dêrikê, Doza Bêspîn, Doza JÎTEM’ê ya Qoserê, Doza Licê, Doza Vartinîs, Doza JÎTEM’ê ya Cizîrê û Doza JÎTEM’ê ya Pasûrê hatine girtin. Endamek îstîxbaratê yê berê têkildarî doz ango dosyeyên JÎTEM’ê ji rojnameya Yenî Yaşamê re axivîbû û nav bi nav vegot ku çawa ser dosyeyan hatiye girtin.

Parêzer Erdal Kuzu ku doza JÎTEM’ê dişopîne li ser pêvajoya vekirina dosyeyên JİTEM'ê rawestiya û diyar kir ku pêvajoya vekirina dozan encama têkoşîna civakî ye û wiha got: "Di salên 90'î de gelek mafên mirovan û mafê jiyanê hatin binpêkirin. Bi awayekî dê rastî derkeve holê. Ji ber vê yekê, tekoşîna li vir tê meşandin, bû sedem ku vekirina dozan pêwîst bike. Di encama têkoşîna civakî de ev doz hatin vekirin. Lê niha dixwazin ser vê rastiyê bincil bikin. Bi vê yekê hebûna JÎTEM’ê qebûl dikin. Girtina dosyeyan encama lihevkirinê ye. Biryara dewletê ye.”

Têkoşîna girtiyan tim bi ser ketiye

Navenda Nûçeyan

Di dîroka cîhanê de gelek caran çalakiya grevên birçîbûnê wekî ‘bêîteatiya sivîl’ pêş ketine. Kesên ku neheqî qebûl nekirin ji bo mafê xwe biparêzin ketin greva birçîbûnê. Di dîrokê de gel her tim piştgirî da çalakgeran.

Di sala 1991’ê de di Danezana Malta de Greva Birçîbûnê ji bo kesên di çalakiyê de wekî ‘Kesên aqilê wan li serê wan, bi vîna xwe biryar dane û ji ber vê yekê di nava demeke diyar de xwarinê red dikin’ tê pênasekirin. Çalakiyek civakî-polîtîk e. Di çalakiyên greva birçîbûnê de xwarin tê boykotkirin. Çalakiya bêdem û bêdorveger û çalakiya bi dorveger heye.

Li Tirkiyeyê jî dema girtîgeh tê gotin, li aliyekî binpêkirina mafên mirovan, li aliyê din berxwedana girtiyan û çalakiyên greva birçibûnê tên aqilan. Girtiyên ku herî zêde li ber xwe didin û dikevin grevê girtiyên siyasî ne. Girtiyên siyasî ji bo zextên li dijî wan û li dijî nirxên wan bi dawî bibin, ji salên 1981’ê heta niha gelek caran ketine greva birçîbûnê û rojiya mirinê. Niha jî li hemû girtîgehên Tirkiyeyê girtiyên PKK û PAJK’ê 184 roj in li dijî tecrîda li Îmraliyê di greva birçîbûnê de ne.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan 22 sal û 6 meh in li Girtîgeha Tîpa F ya Ewlehiya Bilind a Îmraliyê di bin tecrîdê de ye. Ji ber tecrîda li Îmraliyê girtiyên PKK û PAJK'ê di 27'ê Mijdara 2020'î de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bi dorveger a 5 rojan kirin. Girtiyan di 14’ê tîrmeha 2021’ê de çalakî derbasî pêvajoyek din kirin û niha ji her 15 rojan carekê dewrî komek din dikin.

Girtiyan tim serî hildan

Li Tirkiyeyê cara yekemîn di 27'ê gulana 1960'î de Nazim Hikmet bi 2 rojan dorveger beriya ku Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan bên darvekirin di 1972’an de dest bi çalakiya grevê kir. Herî zêde piştî darbeya leşkerî ya 12’ê Îlona 1980'yî grev li Zindana Amedê bi rojiya mirinê derket pêş. Girtiyên siyasî li dijî şertên xerab û îşkenceyê li Zindana Amedê di sala 1982'an de ketin grevê. Piştre ketin rojiya mirinê. Girtî Alî Erek di 20’ê Nîsana 1981’ê de bi zorê xwarin pê dan xwarin û jiyana xwe ji dest da. Di 14’ê Tîrmeha 1982’an Kemal Pîr, M.Hayrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Alî Çiçek ketin rojiya mirinê. Çalakiya wan bû dîroka berxwedanê. Li heman girtîgehê di sala 1984’an de Orhan Keskîn û Cemal Arat ketin grevê û jiyana xwe ji dest dan. Di Hezîrana 1984’an de li girtîgeha Sagmalcilarê girtî Abdullah Meral, Fatih Oktulmuş, Haydar Başbag, Hasan Telcî ketin grevê û jiyana xwe ji dest dan. Di sibata 1988’an de li Zindana Amedê Mehmet Emin Yavuz ket grevê. Di sala 1989’an de girtî Husnu Eroglu û Mehmet Yalçinkaya li dijî sirgûnê ketin grevê û jiyana xwe ji dest dan. Di sala 1995’an de li 20 girtîgehan zêdeyî 5 hezar girtî ketin grevê û 2 girtiyan xwe feda kirin. Di sala 1996’an de girtî li 6 zindanan ketin greva birçîbûnê û 12 girtiyan jiyana xwe ji dest da. Di van hemû çalakiyan de her çend bedel hatibe dayîn jî girtîgehê gav paşve neavêtiye.

Li Tirkiyeyê çalakiya herî zêde belav bû, di navbera 2000-2007'an de pêş ketin û 68 girtî mirin. Girtiyên siyasî li dijî tîpa F ketin grevê û di mudaxaleya leşkerî de 33 kesan jiyana xwe ji dest dan. Girtiyên siyasî li dijî tercîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di 12'ê Îlona 2012'an de dest pê kir û 68 rojan berdewam kir. Piştî çalakiyê daxwaza girtiyan pêk hat û bi Ocalan re hevdîtin hatin kirin. Di 2016'an de 8 rojan û di 2018’an de jî bi pêşengiya Hevseroka KCD'ê Leyla Guven 200 rojan berdewam kir. Di van çalakiyan de daxwazên çalakgeran pêk hat û hevdîtin hatin kirin. Di 2019’an de jî 30 girtî bi heman armancê ketin rojiya mirinê. Piştî çalakiyê hikumetê daxwazên girtiyan qebûl kir.

Di 2017'an de li Dersîmê Kemal Gun ji bo hestiyê kurê xwe bistîne ket grevê. Semih Ozakça û Nuriye Gulmen ên bi KHK'ê hatin îxrackirin ji bo mafê xwe bistînin ketin grevê. Di sala 2020'î de endamên Grup Yorumê Hêlin Bolek û Îbrahîm Gokçek ketin rojiya mirinê. Hêlîn Bolek piştî 288 rojan jiyana xwe ji dest da. Îbrahim Gokçek jî piştî 323 rojan jiyana xwe ji dest da. Mustafa Kocak û Prz. Ebru Timtik jî ji bo darizandina biedalet ketin rojiya mirinê û jiyana xwe ji dest dan. Di 20 salên dawî de girtî bêtir li dijî tecrîd û izolasyonê ketin grevê. Lê her çend hikumetê gav neavêt jî gelê cîhanê piştgirî da doz û têkoşîna wan. Li Tirkiyeyê di çalakiyên greva birçîbûnê de 29 kesan jiyana xwe ji dest da.

Li cîhanê dîroka grevê

Di dîroka cîhanê de cara ewilî çalakiya greva birçibûnê di serdema Împaratoriya Romayê de pêk hat. Cara yekemîn Nerva li Roma li dijî kuştin û îşkenceyê ketiye grevê.

Dîsa li Hindistanê kesên mexdûr bûn serî li vê rêbazê dan. Di salên 1930’î de li Hîndîstanê Mahatma Ghandî yê di bin dagirkeriya Împaratoriya Îngîlîstanê de bû, dest bi çalakiya ‘Ahimsa’ ya li gorî felsefeya bêîteatê kir. Di dîroka tekoşîna polîtîk de herî zêde Îrlandayî derdikevin pêş. Di dîrokê de yekem car bi awayekî girseyî di sala 1880'yî de pêş ket. Çalakiya herî girseyî di sala 2013'an de li Eyaleta Californîa ya DYA'yê li girtîgehan bi tevlêbûna 30 hezar girtiyan pêk hat. Grevaherî demdirêj li Hindistanê pêş ket. Lê li gorî hin îdîayan jî tê gotin ku cara yekemîn Berîza Zayînê di navbera salên 400 û 750’î de di efsaneyên Hîntan de derbas dibe.

DIBE KU DÎSA KOÇBER BIBIN

Armanc belavkirina girseya polîtîk e

■ Rizoyê Xerzî

Gelek taxên navçeya Sûrê hatin xerakirin û li şûna wan mîmariyek nû hat avakirin. Dîsa tê xwestin ku hin taxên navçeyên Yenîşehîr û Rezan bê xerakirin û li şûna wan mîmariyek nû ava bikin. Ji bo agahiyên der barê vê mijarê de, me hevdîtinek bi avahîsaz Şerefxan Aydin re kir. Em bi hev re li bersiv û şîroveyên Endezyar Aydin binêrin.

Di serî de armanca van xerakirinan çiye? Mîmariya ku li Sûrê tê avakirin, li gorî çi tê avakirin. Dixwazin nasnameyek çawa pêş bixin?

Piştî şerê li navçeya Sûrê yê di salên 2015-2016'an de pêş ket, dewlet bi giştî dixwaze vê çanda ji hezaran salan heta îro hatiye, serobino bike û çandeke li gorî xwe ava bike. Yanî bi gotineke din dixwest ku demografiya wê derê xira bike û çandeke li gorî ya serdestan ava bike. Avahîsaziya li wê derê û ew neqiş û sembolên ji hezaran salan hatine ji holê rabikin, winda bikin û nasnameyeke nû li wir ava bikin. Dema mirov li van tiştên derketiye holê dinêre, bi taybetî di aliyê avahîsazî û bajarvaniyê de, mirov dibîne ku tu nasname an jî tu nirxekî ku giringî û taybetiya wê hebe di van avahiyên ku avakirine de tune ye.

Çawa ku em bibêjin pergala TOKÎ li hemû Kurdistanê û Tirkiyeyê avahiyên yek tîp û bi yek şêwe çêdike, mirov dibîne ku li Sûrê jî ew avahî dibe ku li gorî TOKÎ'yan qatên wê hindikin, lê bi heman mantelîteyê hatine avakirin. Dema mirov bala xwe bide encamên ku li Sûrê derketin holê, mirov dibîne ku pir armancên wan ên cuda hebûn. Armanca ewil xwestin demografiyayê biguherînin. Yanî ew çanda ku bi hezaran salan li wir hebû bi taybetî piştî salên 1980'yî ku şerê dewletê û PKK'ê dest pê kir, gelek gundên ku hatin valakirin û şewitandin xelkên wan xwe li vê navçeya Amedê girtibûn. Ango li Sûrê bi cih bûbûn. Îca dema mirov bala xwe dide girseya ku li wir dijî mirov dibîne ku ew girseyeke polîtîk e. Lewre jî dewletê xwestiye ku wê girseyê ji hev belav bike. Ji ber di dema çalakî û meşan de, di dema hilbijartinan de dengê herî zêde û bilind ji wê navçeyê derdiket.

Dewletê her tim gelê Sûrê wekî gefekê li hemberî xwe dibîne. Lewre jî li gorî wan ew cihekî ku diviyabû mudaxele lê were kirin û ev girse ji hev were belavkirin. Di encama destwerdana Sûrê de dewlet giha wê armanca xwe û ew girse parçe kirin.

Her mîmariyek nasnameya çand, civak, aborî û avhewaya wir nîşan dide. Ev yek çiqas li ber çavan tê girtin? Heke nayê girtin çima?

Bi rastî wekî em dizanin Sûr cihekî taybet e. UNESCO di sala 2015'an de Sûr wekî mîrateya çandî tescîl kir. Êdî ew mîrate bû ya hemû dinyayê. Ne tenê ya Kurdistanê ye. Yan jî ne tenê ya Tirkiyeyê. Ji ber ku di dîroka wê de bi dehan şaristanî hatine û çûne û bi dehan netew hatine wir. Her neteweyê jî li vir neqşên çanda xwe di wan avahiyan de nîşan dabû. Lê piştî rayedarên dewletê ev avahî hilweşandin û avahiyên nû li şûna wan çêkirin, êdî tu girîngiya wan avahîsaziyan nema. Tenê mirov dikare bibêje ku ji van avahiyên niha li wir li şûna yên kevin hatine çêkirin, taybetmendiyek berê maye. Ew jî hewşê wan hene. Rayedarên dewletê bi vê yekê pesnê xwe didin û dibêjin avahîsaziya berê ji nû ve rakir ser piyan. Lê tu têkiliya van avahiyên nû bi yên berê re tune ye.

Wekî ku we jî anî ziman ji xwe rewşa gelê Sûrê ya aborî li ber çavan bû. Piraniya wan kesên ku gundên wan hatibû valakirin û koçber bûbûn ji neçarî hatibûn li wir bi cih bûbûn. Xaniyê wan hatin xerakirin û li şûna wan xaniyekî nû ava kirin. Xaniyê berê bi 40-50 hezarî kirîn û avahiyên nû niha bi buhayekî gelekî giran difiroşin malbatan. Malbat dê çiqas karibin têkevin van xaniyan. Çima xaniyan wisa buha didin welatiyan?

Nişteciheên Sûrê yên ku piştî salên 80 û 90'î koçber bûbûn û hatibûn li wir bi cih bûbûn di warê aborî de gelekî lewaz bûn. Piraniya mirovan xizan û bêçare bûn. Lewre jî ne pêkan e ku ew mirov bikaribin van avahiyên nû hatine avakirin bikirin. Di wê demê de me wekî avahîsazên Amedê li qadê hin xebat dimeşandin. Em di nava gel de bûn. Wê gavê dema ku dewletê ew ji cihên wan kirin, xaniyên wan bi 40-50 hezarî dikirîn. Lê di şûna wan de ev avahiyên ku hatine çêkirin jî buhayê wan ê herî kêm derdora 750 hezarî ye. Yanî buhayê wan ji sedî 600-700 ji nirxê ku dabûn xaniyên wan ê berê zêdetir e. Her wiha dewlet wekî ku firsetekê ji xwediyên wan xaniyên berê re dinirxîne û dibêje; Mafê pêşî yê kirîna van avahiyan ji niştecihên Sûrê re ye û heke mirovek niştecihê Sûrê bixwaze van avahiyan bikire em dikarin ji sedî 10-20 jê re kêm bikin. Lê ew bi xwe jî dizanin ku ji sedî sed jî ji wan re kêm bikin ew nikarin van avahiyên nû bikirin. Lewre jî ew cara duyemîn dîsa neçarî koçberiyê bûn û çûn navçeyên din ên Amedê bi cih bûn. Bêguman wan jî dîsa xwe li taxên ku nêzî çanda wan e û taxên ku xanî lê erzan in girtin. Bi vê yekê dîsa derdikeve holê ku dewletê xwestiye ev çanda têkiliyên germ ên cîrantî û parvekirinên ku bi hezarê salan berdewam kirine ji holê rake û wan ji hev belav bike.



Ew kesên ku gundên wan hatin şewitandin û valakirin li Sûra Amedê bi cih bûbûn dîsa neçar man koç bikin û niha jî piraniya wan li taxa Rezan a Amedê dijîn dibe ku ew dîsa bi koçberiyeke din re rû bi rû bimînin

Wekî we jî destnîşan kir dema ku gelê Sûrê neçar bû ji cih û warê xwe derkeve berê xwe dan taxên ku nêzî çanda wan be û hinekî erzan be ku bikaribin bi wan pereyên xwe yên kêm xaniyekî li wir bikirin an jî kirê bikin, taxa li gorî wan şert û mercan taxa Rezan (Baglar) bû, lewre piraniya niştecihên Sûrê xwe li wê taxê girtin. Lê niha tê gotin ku dê wir jî biguherînin û avahiyên nû li şûna yên kevin ava bikin, gelo ew dê dîsa neçarî koçberiyeke din bibin û dê bi ku ve herin?

Em ji bîr nekin ku niştecihên navçeya Rezan û bi taybetî yên taxa Kaynartepe ku piraniya xelkê Sûrê xwe lê girtine, ew bi xwe jî kesên ku ji gundan koçberî wir bûne ne. Bi rastî tevî ku bajar ewqasî mezine jî lê ji ber şêniyên hezarên gundên ku hatin şewitandin û xirakirin xwe lê girtine, êdî cihê mirovan li wir nemaye û bajar têra wan nake. Bi ser de jî di çend salên dawî de gelek koçber ji ber şerê li Sûriyeyê jî hatin li wan deran bi cih bûn. Îca dewletê niha plansaziyeke din çêkiriye. Dixwaze wir jî biguherîne û li gorî xwe saz bike. Dema mirov bala xwe dide sedemên fermî yên ku destnîşan dikin, meseleya ewlekariyê derdikeve pêş. Dewlet dibêje ew der hem di aliyê civakî de hem jî di aliyê avahîsaziyê de ne ewle ye. Lewre jî dibêjin em ê wê taxê xira bikin û ji nû ve ava bikin. Dema mirov li pratîka karên dewletê dinêre bi taybetî di salên dawî de li Sûrê binêre, mirov texmîn dike ku ew dixwaze demografiya taxa Kaynartepe jî biguherîne.

Gelo dê guhertineke çawa li wê taxê bikin?

Wekî tê zanîn avahiyên di wan kuçeyên teng ên kaynartepe de dibe ku bihayekî wekî xaniyên berê yên Sûrê jî pê nedin û wê bi buhayekî gelekî erzan ji xelkê bikirin. Avahiyên ku dê li şûna wan bên avakirin jî dê buhayê wan gelekî zêde be û bi kêmanî deh qat ji buhayê yên kevin buhatir be. Lewre jî ew niştecihên wê taxê dê nikaribin wan avahiyên nû bikirin. Dê bi pêleke din a koçberiyê re rû bi rû bimînin. Di vê de jî dê koça sêyemîn dest pê bike û encax hin mirovên dewlemend bikaribin wan xaniyên nû bikirin û pê re jî çandeke nû li şûna çanda wan niştecihan bi cih bibe.

Te behsa ewlehiyê kir ku dibêjin ji ber sedemên ewlehiyê divê em van guhertinan bikin, lê di heman demê de em dibînin ku di wan taxan de aşkera û li pêş çavên her kesî madeyên hişbir tên firotin û tu destwerdaneke berbiçav ji alî dewletê ve nayê kirin, sedem çi ye?

Dema ew behsa ewlehiyê dikin ne tenê ji bo van aliyên civakî wiha binav dikin. Lê dema dewlet behsa ewlehiyê dike ew ne ji bo van pirsgirêkên civakê dibêje. Ji ber girseya li wir polîtîk e û dewlet wê girseyê wekî gefê li dijî xwe dibîne. Yanî ji aliyê polîtîk ve wê girseyê ji bo xwe wekî gefekê dibîne û dibêje ku pêwist e ew girse were belavkirin. Wekî mînak dema ku ew girse piranî dengê xwe didin partiyeke kurd ew ji bo dewletê wekî gefekê tê hesibandin.

Wekî Odeya Mîmaran a Amedê bi giştî di çarçoveya van guhertinên di Sûrê de çêdibin bi çi rengî şêwra we tê kirin an jî nêrîn ji we hatine girtin? Tu roleke Odeya we di van guhertinan de heye?

Bi rastî ji aliyê fermî ve ne bi rengekî raste rast ne ji jî ji bo şêwirmendiyê tu têkiliyek bi Odeya Avahîsazan re nehatiye çêkirin. Tevlêbûna me di wî aliyê fermî de çênebûye. Lê wekî din bi darê zorê me xwe kiriye nava wê pêvajoyê. Di destpêka şerê ku di 2015'an de li Sûrê qewimî û di dawiya şer de ji bo ku Sûr bê parastin gelek bangewaziyên me hebûn. Ji bo wan kirinên ku li Sûrê dihatin kirin me doz vedikirin. Me bertek û fikirên xwe bi raya giştî re parvedikir. Lê belê bi rengekî fermî em tev li wê pêvajoyê nehatin kirin. Gelek caran bi rengekî fermî me serî li Walitiyê dida, da ku em tev li wê pêvajoyê bibin. Lê me tu caran bersiveke erênî ji wan negirt. Me jî bi hin xebatê xwe bi zorê xwe ji derve ve tev li wê pêvajoyê kir.

Şerefxan Aydin kî ye?

Avahîsaz Şerefxan Aydin di sala 1984'an de li Licê hatiye dinyayê. Ji ber ku cerdevanî li ser gundên wan ferzkirin ew neçar man ku dest ji gundê xwe berdin û werin li Amedê bicih bibin. Aydin di sala 2008'an de li Zanîngeha Dicle ya Amedê Beşa Avahîsaziyê qedandiye. Ew çend salan di şaredariya Amedê de xebitiye û bi hatina qeyûman re ew jî wekî bi hezaran xebatkarên din ên şaredariyê ji kar hatiye dûrxistin. Aydin 4 salan Hevserokatiya Odeya Avahîsazan a Şaxê Amedê kiriye.

Herkesî ew wekî endamekî mala xwe nas dikir

Îbrahîm Seydo Aydogan

Li pişta wan barê kurdayetiyê, weke kulekê, weke birînekê, di şeveke zivistanê de ew ji malan dan hevdu. Ew wê gavê hê 5 salî bû. Sal 1937 bû. Ew ji Nahçivanê rakirin û sirgunî Kazakistanê kirin. Di nava şevekê de, gava ku trên di nava berfê de rawestiya, ji wan re gotin: "*Hûn ê êdî li vira bin, li vir bijîn û li we qedexe ye ku hûn ji vir biçin devereke din* Ji wê hingê ve ye ku li Kazakistanê ne û niha civateke wan ya zêdetirî sed û pêncî hezar kesan heye.

Gava ku min ew di sala 2019'an de li Almatayê dît, ji min re behsa wê çîrokê kir: *"Ji her malê, mezinê malê kî be, ew birin û kes nema ew dîtin. Yê me, mezinê mala me, birayê min bû."*

Nadir Nadirov, li wî gundê nû mezin dibe, gundê ku ji xwe re li rojhilatê Kazakistanê ava kirin. Dem tê û gava ku dixwaze biçe zanîngehê, ji ber ku qedexe hê dewam dike, destûr ji wî re dernakeve ku biçe bajêr. Got: *"Em kurd bûn. Gava ku em jî anîn vê derê, me nizanîbû ka sebeb çibû. Dû re me fahm kir ku sovyetê nedixwest ku têkiliya me bi kurdên Bakur re hebûya, lewre çûyin û hatin pir bû. Lewma em rakirin û birin. Me ji xwe re li wir warekî nû ava kir. Lê belê, mafê me tunebû ku em weke xelkê li welêt bijiyana. Qedexe bû ku em biçûna bajêr an zanîngehê. Nedixwestin ku em xuya jî bibin."*

Nadir wê hingê bi helwêsteke zîrek radibe. Biryarê dide ku ji Stalîn re nameyan bişîne. Di nameyên xwe de dozê dike ku mafê xwendinê bidine wî. Dibêje: *"Ma ez jî ne kurekî vî welatî me? Çima mafê min tuneye ? Ma ne cenabê te digot bixwînin û bixwînin. Hingê bihêlin ku ez jî bixwînim."* Axir çend meh bi şûn de bersiv jê re tê ku daxwaza wî hatiye pejirandin. Hingê diçe Enstîtuya Mamostetiyê ya Gogol û beşa kîmyayê dixwîne. Lê xewna wî mezintir e. Piştî zanîngehê, li Moskovayê mastera xwe dike. Sala 1967'an, doktorayê dîsa di warê kîmyayê de bi dest dixe û sê sal bi şûn de dibe profesor. Di Akademiya Zanyariyên Bilind ya Kazakistanê de neh salan cîgiriya serokê akademiyê dike ku ev cih bi destê biyaniyekî nediket. Lê zîrekiya wî ya zanistî ji wî re xatirekî mezin dabû peydakirin. Yekî ne kazak, yekî kurd, sirgunî, bi vî awayî, bi zîrekî û hêza xwe ve digihîşt deverên herî bilind û xelatên wiha bi dest dixistin ku ji bo gelek kesan xewn bû.

Ew serbilindahiya kurdan bû

Digot: *"Sovyetê hingê qiymetekî pir mezin dida ilmê û aliman."*

Bi salan şûn de, bi rêya nameyên ku li ser hev ji Moskovê re dişandin, derfet bi dest xist ku here arşîva li ser birayê xwe bibîne. Hingê pê dihise ku birayê wî kuştine. Bi wê kulê jiya û bi wê kulê çû. Lewma her bi xebatê ve daket û her bi ser ket.

Li Kazakistanê, li Sovyeta berê û heta li Fransayê jî bi nîşanên payebilind hat xelatkirin, lewre xebatên wî yên li ser petrokîmyayê rê li ber zanistiya vî warî vekiriye. Digot: *"Hemû rêyên ku li Kazakistanê çêdibin, hê jî li ser teknîka min tên avakirin."* Lewma jê re digotin: "Mareşalê petrolê." Wî bikaranîna petrolê ji bo avakirina alavên jiyanê dinirxand, weke qîr û asfaltê û ilmê kîmyaya modern li wir danîbû. Nêzî hezar gotar û pirtûk û monografiyên zanistî li pey xwe hiştin û bi sedan serkeftinên zanistî ku bêhempa ne. Pirtûka wî ya bi navê 'Gaz û Petrola Kazakistanê' di sala 1996'an de bû pirtûka salê. Teknîka 'Rekombînasyonê' ku wî di warê bikaranîna petrolê ya di seyareyan de danîbû, îro jî li her derê tê pêkanîn. Digot: *"Ez her xebitîm ku li her derê bi başî behsa kurdan bikin da ku bizanin ku kurdek bi ser dikeve."* Kurdek di warê zanistî de qet ewqasî bi ser neketiye; lewma ew serbilindahiya kurdan bû.

Li Moskovê vîzevîza zimanê kurdî

Ji aliyê siyasî ve jî digel zextên li ser kurdên sovyetê jî, bi hezaran kîlometre li dûrî welêt, Kurdistan her di dilê xwe de heband. Li Kazakistanê serokatiya kurdên Kazakistanê kir, rê li ber kurdên ciwan vekir û di nava civatê de xatirekî mezin wergirt ku herkesî ew weke endamekî mala xwe nas dikir. Lewma herkesî jê re digot: "Apê Nadir." Têkiliya xwe bi hemû tevger û serokên kurdan re datanî. Hê di xortaniya xwe de, li Moskovayê dabû pey kurdên din. Digot: *"Ez ji ber serkeftina xwendinê ewqasî şa bûm ku min dixwast kurdên din bibînim û şabûna xwe bi wan re par ve bikim."* Ji kesên dora xwe dipirse. Jê re dibêjin ku kurdek heye, lê kurdê ji Başûr e. Hingê li wir Mela Mistefa Barzanî nas dike. Digot: *"Gava ku me jê re telefon kir, em bi kurdî peyivîn da ku vîzevîza zimanê kurdî biketa têlên Moskovê."*

Xew nediket çavên me

Di salên 90'î de gava ku siyasetmedarên kurdên bakur mecbûr dimînin ku derkevin Ewropayê, Nadirov dîsa milkê xwe li cem wan datîne. Dibe Endamê Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt. Diçe Şamê, serdana Abdullah Ocalan dike û piştgiriya kurdên Kafkasyayê ji wî re dibe. Gava ku li Başûr hikumeta kurdî ava dibe, gava ku bi referandûmê serxwebûn çêdibe, her dîsa pişta tevgera kurdî digire. Wê demê ji Mesûd Barzanî re nameyekê dişîne û dibêje: *"Ji vê rêyê venegere, bike."* Gava ku li Rojava şoreşê dest pê kir, digot: "Xew nediket çavê me, em ditirsiyan ku Rojava bikeve destê wan bêbavan; her roj em li benda xebera serkeftinê bûn." Digot: *"Divê kurd destê xwe bidin hev, xwe bikin yek û ji bo doza miletî bi hev re bixebitin."*

'Apê Nadir' koça dawî kir

Prof. Dr. Nadir Nadirov di 25'ê tebaxa 2021'ê de bi nexweşiya penceşêrê li Almatayê, di 90 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Kurdan mêrxasek, Kurdistanê lawekî xwe ji dest da. Mîna Prof. Dr. Kinyazê Îbrahîm ku çend roj berî wî çûbû rehmetê, yê ku piştî Nadirov ew bûbû serokê kurdên Kazakistanê û bi xebat û zanîn û berhemên xwe yên li ser dîrok û ziman û çanda kurdî ve milkek li pey xwe hişt. Apê Kinyaz ji min re got: *"Hûn nizanin, lê li vir Kurdistaneke me jî heye."* Tirsa wan bi tenê ew bû ku werin jibîrkirin. Lewre tu bi xwe ji bîr nekî jî, gava ku tu ji bîr dibî, hingê tu bêxwedî yî û hingê tu dimirî.

Çawa dibû ku ewqasî bi xewna welêt ve girêdayî bûn? Her kurd mabûn û digel ewqas dûrî û dijwariyan jî li kurdayetiya xwe xwedî derketibûn. Serkeftin û serbilindahiya xwe weke serkeftina hemû kurdan dabûn naskirin... çawa dibû? Bersiv hêsan bû. Li ku bûna jî wan xwe weke nûnerên civaka kurdan, weke pêşengên kurdan nas dikir û weha bûn jî. Li malên wan bi kurdî dihat axaftin û zanîbûn ku divê tiştekî li pey xwe bihêlin. Apê Nadir û Apê Kinyaz bi vî awayî milkekî Kurdaniyê ji me re hişt, hezkirina welatekî dûr, dilsoziya bi miletê xwe re.

Di rêya vegerê de

Min li ser wan herdu xweşmêran, wiha nivîsandibû di rêya vegerê de:

"Bi hezaran kîlometre li dûrî te me, Gewrê. Siwariyê hespê boz bûm ez. Xwediyê berbejnekê bûm ku têde sê qulwellah û fatîhayek hebû. Siyabend bûm, Mem bûm, Derwêşê Evdî bûm.

Me qesda welatekî kir, me qesda xakekê, me qesda dayikekê dikir. Li Hewlêrê zarokek bigiriyaya heger, me taziye û şûn datanî li Almatayê. Kes hay jê nebûya jî. Lewre me ji bîr nekiribû ku em kurd in û pê serbilind in. Em jî zarokên wê dayikê ne, yên wê axê ne û hertim wê xewnê dibînin ku navê wê Kurdistan e.

Bîranînên min li serhildanan mane, Gewrê. Serboriyên min şopên qira milletekî ne, nede dû. Ger te dil heye wê çîrokê bixwînî, pêşî bimbeyan biteqîne di hembêza min de û êgir li bênderan bireşîne; lewre li welatekî pir dûr in xewnên min û te, zarokatiya me.

Em nefî bûn; me bavek hişt li wan deran û birayek. Çar bazin firotin dêya min, da ku ez jî neyêm kuştin. Min ji bîr nekir... Lewma dilikume hezar caran zimanê min, çi cara ku peyvan bînim ser hev. Her bizane, bes welatek bû xewna min, welatek, bi hezaran kîlometre dûr be jî.

Çav li rê mam

Sayîme Xakpûr

-Rojbaş Xezal!

-Rojbaş Nêçîrvan, çawa yî?

-Ez baş im Xezala min, min pir bêriya te kiriye, gelo em îro dikarin hevdîtinekê pêk bînin?

-Erê Nêçîrvan. Demjimêr 4'ê êvarê cihê hevdîtina me ya her carê.

Ka ez hinekî xwe ji bo delalê ber dilê xwe bixemilînim. Ez îro pir şad im pir. Ez kevok im lêylim lêylim lê.

Lêê.. ez ser bana ser bana, ez kevok im lêylim lêy lêyyy.

-Selam Nêçîr. Li ser çavan re hatî delalê. Tu wekî her carê pir xweşik bûyî.

-Spas dikim can. Tu jî wekî her carê bi gotinên xwe yên xweş min mest û medhoş dikî Nêçîrvanê dilê min.

-Xezala min, ez îro gelek xemgîn im. Ew çend roj in pir aloz im. Divê hin tiştan ji te re bibêjim.

-Bêje Nêçîr! Ka ji min re bibêje çi bûye?

-Xezala min a şêrîn, min biryar daye ji vir derkevim û biçim Ewropayê, çi dema ez li wir bi cî bûm û min mafê xwe yê rûniştinê bi dest xist, ez ê te jî vexwînim cem xwe û em ê dest bi jiyanek nû bikin. Tu li benda xebera min bimîne delala min. Ez ê bi hêviya wê rojê ku tu yê werî cem min, hemû kul û derd û hîcran û firqetê tehemul bikim.

-Baş e Nêçîrvan, ku tu wisa ji bo me baş dibînî em ê wisa bikin. Ez ê li benda xebera te bimînim. Bi hêvî me demek zû bikarî mafê xwe yê rûniştinê bi dest bixînî. Li xwe miqate be Nêçîrvano, xwe miqate be, ji te hez dikim.

-Ax Xezalê, gava ez li nav çavên te dinihêrim stêrkên esmanê heftan dibînim, awirên te nexweşên ber sikratê dubare vedigerîne jiyanê, ez li ber bejna te û evîna te mîna pelên dara mecnûnê serşor im. Xezalê bê te jiyan nabe, ez nikarim bê te kêliyekê jî derbas bikim. Ji te hez dikim, bê te emir naçe serî. Sedema jiyana min, bi hêviya hevdîtinê, bi xatirê te.

Ev gotinên xweşik û dilhebîn ku dilê min dilerizandin, min nizanîbû cara dawiyê ye ez ê wan gotinên wek jehra şîrîn bibihîzim. Ez û Nêçîrvan wê rojê demeke dirêj axivîn piştre me xatir ji hev xwest û bi hêviya ku wê rojek bê em ê bigihîjin miraza dilê xwe, her yek ji me vegeriya malê. Wê şevê heya berê sibehê xew bi çavên min neket. Can ji can veqetiyabû, roj li şevê bêhêvî mabû ji ber ku tariya şevê di cihê xwe de ingirîbû û rê nedida ku tav roniya xwe bide ser erdê. Roja din ji ber soza ku min dabû Nêçîr, min xwe li ber nexist û min hewl da jiyana xwe wekî berê bidomînim ta ku Nêçîr derbasî Ewropayê bibe û mafê rûniştina xwe bistîne ku bikaribe min jî vexwîne cem xwe.

Sala dawiya qedandina zankoyê bû û divê min demek pir zêde ji ezmûnên xwe re veqetandiba û min wisa jî kir. Demeke dirêj li ser çûna Nêçîr derbas bûbû lê ti xeber ji wî nehat, kesek ku bikaribim pirsa Nêçîr jê bikim tunebû, hema hema dostek hevalek yan kesek ji malbata wî min nas nedikir ku bikarim kesera dilê xwe ji wan re bibêjim. Her ku diçû ez zêdetir dilgiran û bêtab dibûm. Şevek ji şevên zivistanê yên her sar û berfîn bû gava çavên min ji ber girî û li bendîmanê westiyayî çûbûn xweweke giran. Wê şevê min xewnek seyr dît.

Min di xewnê de dît du mirovên nenas li deriyê mala me xistin û pirsa min ji dayîka min kirin, ez bi dengê wan veciniqîm û min xwe gihand ber derî ku bizanim çi dibêjin.

Paketek di destê yekî de bû û di destê dî de jî cil û bergên Nêçîrvan hebûn. Ew cil û berg û paketa ku min nizanîbû di hundirê wê de çi heye, ji min re anîbûn.

Radestî min kirin û çûn. Min destpêkê kêliyekê li cil û bergên Nêçîr temaşe kir, piştre ez ji bo vekirina paketê ketim nav hewldanê ku bizanim çi tiştek di hindirê wê de heye.

Dema min pakêt vekir çi bibînim, tenê çend hevok hatibûn nivîsandin:

-Xezala min, dema ez di nav Peravê de dixeniqîm, min tenê çavên te dîtin ku dikeniyan. Ji ber kenê çavên te yên xweşik min êşa mirinê seh nekir.

Heta sax bûm û heta mirim jî min ji te hez kir Xezala min.

Serê sibehê bi êşek giran û xwêdanek sar ji xewê hişyar bûm. Ez di bandora xewna xwe ya bêyom de mabûm û min nizanîbû çi şiroveyê ji xewna ku hatibû canê min ji min bistîne re bikim.

Ez di nav hizir û xeyalan de bûm gava cîrana me ji dayîka min re got:

-Çend roj beriya niha gava komek ciwan ji Ûrmiyê ber bi Ewropayê ve diçûn di nava avê de xeniqîne ku yek ji wan hevalê lawê min e û navê wî jî Nêçîrvan e.

Ji wê rojê heta îro û piştî wê xebera reş, ez bûme dêran û dêr, bi dêr geriyam û bûme dêrana Nêçîrê dilê xwe.

Efrîniyan li Şehbayê Efrîneke din ava kir

Fewaz Reşo

Efrîn di dema krîza Sûriyeyê û beriya dagirkirina wê de bûbû qibilgeha hemû sûriyeyîyên ku ji ber azarên şer û wêraniyê direvin. Bi deh hezaran sûriyeyiyan ji ber êrîşên li herêmên wan berê xwe dabûn kantona Efrînê. Şêniyên Efrînê û Rêveberiya wê ya Xweser ewil Sûriyeyî di nava ewlehî û aramiyê de pêşwazî kirin.

Lê bi êrişên dagirkeriya tirk û çeteyên wê yên li dijî Efrîn û dagirkirina wê; şêniyên ku berê xwe dabûn Efrînê, koçber bûn. Di ser şêniyan, biçûk, mezin û jinan re rojeke tarî derbas bû. Şêniyan ne dizanîn berê wan li ku ye, hema bi koçberiyê re û xelasiya ji êrîş, zilma çete û dagirkeriya tirk re ji warên xwe bi darê zorê koçber bûn.

Dewleta tirk di êrişên de tu çekeke ku bi kar neanî, nehişt. Hemû çekên wê yên NATO'yê bûn. Êrîşên dagirkeriyê mîna roja qiyametê bû, ter û hişk, jin û zarok, kevir, dar û ber didan ber xwe. Lê hêzên navneteweyî û civaka wê bi bêdengiya li hember êrîş û sûcan hevşirîkatî û tevkariya xwe bi dewleta tirk re îsbat kir.



Dagirkirin û koçberî

Hemû şêniyên Efrînê yên koçber dibûn berê xwe didan Kantona Şehbayê, ku ew jî di 2014'an de ji hêla çeteyên DAIŞ'ê ve hatibû dagikirin û di 2016'an de ji hêla Hêzên Cebhet El-Ekrad û Artêşa Şoreşger ve hatibû rizgarkirin.

Şênî li herêm û gundên Şehbayê di malên kavilkirî û wêrankirî de xwe bi cih kirin, ne nan ne av ne jî ewlehî hebû. Lê tenê azar û derdên wan yek bûn. Ew jî bi hev re koçber bûne. Hêdî hêdî av û nan peyda bû. Koçberan malên wêrankirî paqij kirin û tê de bi cih bûn, da ku zarok, kal û jinên temenmezin li ber serma û seqemê nemînin. Di her maleke ji odeyek an jî du odeyan ji 20 heta 30 koçber tê de diman.

5 kampên koçberan

Li aliyekî din jî li nava qeraç û bûrekî girêdayî Fafînê kampek ji koçberan re dihat avakirin, ew jî kampa Berxwedanê bû. Hin rêxistinên xêrxwaz dibûn alîkar. Heta wê demê hinekî saziyên Rêveberiya Xweser û endamên wê yên li Efrînê hêdî hêdî rewş û karên xwe anîn serhev û ew jî di radeya yekemîn de bûn desteka avakirina kampê. Heta niha li kantona Şehbayê 5 kampên koçberan hene; Kampa Berxwedan, Serdem, Koçer, Veger û Şehbayê. Kampên Berxwedan û Serdem xwe dispêrin navê Berxwedana Serdemê ya şêniyên Efrînê li hember êrişên dagirkeriya tirk.

Hinekî rewşa koçberan a ku di ser hev de, di odeyekê yan jî du odeyan de ji hev derket û li kampan bi cih bûn. Piştî demekê kocber li Şehbayê bi cih bûn. Ji ber ji Efrînê xuyaye û da ku çavên wan her tim li vegerê bin. Li her gundekî û her kampekê koçberan komîna xwe ava kirin. Êdî komîn bi mijar û xwestekên koçberan radibûn. Li gel wê jî hemû saziyên li Efrînê li Şehbayê bi cih bûn, li wir saziyên Şehbayê bi xwe jî hene û bi hev re yek karî û xebatê dikin.

Lê tevahiya şêniyên Efrînê li Şehbayê neman, dema koçberiya ji Efrînê hejmar zêdetirî 400 hezar bû, yê niha mayî jî zêdetirî 200 hezar e. Ji ber hin şêniyên Efrînê yên resen li Efrînê man, hin çûn Helebê, hin jî çûn aliyê Cizîr û Firatê.

Aktîfkirina saziyan...

Piştî koçberiyê şêniyên Efrînê yên li kantona Şehbayê şêniyan sazî û xebatên xwe li gorî xwestek û pêdiviyên xwe ji nû ve aktîf kirin, ya herî girîng jî Nexweşxaneya Efrînê bi hemû kadroyên xwe yên Efrînê kete pratîk û ximzeta koçberan û bê pere. Lê ev yek ne tê wateya ku her tişt aram e yan jî şênî vegerê nafikirin. Berovajî wê aktîfkirina saziyan yekane berxwedana li hember dagirkeriya tirk û çeteyên wê û vegera li Efrînê ye.

Dagirkeriya tirk xwest ku bi koçberiya şêniyên Efrînê re çand, moral û vîna wan têk bibe û tew bi war û kurdîtiya xwe nefikirin. Lê nizanî yên ku 58 rojan li hember duyemîn hêza NATO'yê li ber xwe dane, dê li ku deverê dibe bila bibe, wê armanca wan a sereke xebat û berxwedaneke ji bo vegerê be. Dagirkeriyê ev yek dît, dîsa êrişên xwe li dijî tevahiya herêmên Şehbayê berdewam kirin. Komkujî li Til Rifetê û Aqîbê pêk anîn, zarok û jin qetil kirin.

Dorpêç û ambargo

Digel êrişên dagirkeriya tirk û çeteyên wê yên rojane de, weke berdewama êrişan û komployeke li dijî şêniyan, hikumeta Şamê dorpêç û ambargoyeke tund li ser kantona Şehba ku tê de bi hezaran koçber hene ferz kiriye. Nahêle ne derman, ne sotemenî û ne jî madeyên xwarinê derbasî kantonê bibin. Her wiha bi ambargoyê re gelek sivîlan jiyana xwe ji dest da. Ji ber hikumeta Şamê nahêle nexweş derbasî Helebê bibin. Beriya vê bi du mehan jî 4 sivîlan jiyana xwe ji dest da, di nav de zarok jî hebûn.

Zehmetiyên li kampên Şehbayê

Şehba li ser koçberan bûye girtîgeh, ji ber êrişên dagirkeriyê ji aliyekî ve, dorpêç û ambargoya hikumeta Şamê jî ji aliyekî ve heye. Ambargoya hikumeta Şamê ji bilî tevkarî û hevşirîkatiya bi dewleta tirk a dagirker re tiştekî din nîşan nade. Bo nimûne der barê êrişên dagirkeriya tirk û çeteyên wê yên li dijî Efrînê hikumeta Şamê tu daxuyanî yan jî helwesteke şermezarkirinê nîşan neda. Tevî ku di navbera wê û dewleta tirk de peymana Edeneyê heye ku divê di rewşên awarte de her du alî dikarin heta 5 kîlometre derbasî aliyê din bibin. Lê hikumeta Şamê û hikumeta tirk ev hemû peyman, qanûn û mîsaqên navneteweyî yên mafên mirovan bin pê kirin.

Berxwedana koçberan

Koçberên Efrînê ji bo ku dengê xwe bigihînin cîhanê daxuyanî, meş, protestoyan li dar dixin. Li aliyekî din jî bi çandîniya li malan, parçeyên zeviyan ên biçûk debara xwe dikin. Her wiha sebzeyan diçînin da ku debara xwe pê bikin. Di nava wan zeviyan de bi hezaran malbat dixebtin. Bi wê yekê re li beramberî ambargo û êrîşên dagirkeriyê disekinin.

Zarok û ciwanên Efrînê

Qada perwerdê qada herî sereke ya di civakê de ye, ger di civakê de aktîf nebe civak hildiweşe. Bi koçberiyê re Komîteya Perwerdeya Civaka-Demokratîk (KPC-D) û mamosteyên wê zarokên xwe bê perwerde nehiştin. Xanî û dibistanên nîvwêrankirî amade kirin û dest bi perwerdekirina zarok û ciwanên xwe kirin. Digel rewşa koçberiyê jî xwendekar bi zimanê xwe yê dayîkê dixwînin û dibêjin em ê bi zimanê xwe Efrînê û Kurdistanê rizgar bikin.

Di rewşên koçberiyê de dewletên hegemon û kapîtalîst ji bo ku zihniyeta xwe bidomînin yekser dest diavêjin ciwan û jinan da ku civakê hilweşînin. Dewletên hegemon hewl didin di van rewşan de ciwan û jinan ji berxwedanê dûr bixin û hişbirê di nav de belav bikin. Lê ciwan û jinên Efrînê li hember van sosretan hişyar in, bi rêya semîner û panêlan armanc û hedefên dagirkeran dibêjin û civaka xwe ronî dikin.

Xweşkanî

Felemez Ulug

'Dêrsim naşewite, tê şewitandin'

17'ê tebaxê piştî tevgera leşkerî ya li herêma gundên Kûrûkaymak û Danzî yên girêdayî navçeya Xozat a Dersimê şewat derket. Dewleta tirk ya ku çavê xwe ji şawata daristanên bakurê Kurdistanê re digire nahêle şêniyên herêmê jî mudaxeleyî agir bikin. Ji ber ku di dema xwe de mudexaleyî şewatê nehat kirin agir li herêmê belav bû.

Di van çend rojên dawî de ji ber zêdebûna nerazîbûnên rêxistinên civaka sivîl şeklî be jî hin hewildanên mudexalekirina şewatê çêbûn. Lê dema mirov herêma ku şewat lê derketiye mêze dike di serê mirov de pirs çêdibin.

Bêgûman şewitandina daristanên Kurdistanê ne tiştekî nûye. Di vê mijarê de tişta ku tê zanîn û tê qebûlkirin li herêmê ji ber sedemên leşkerî derxistina şewatê ye. Ev rastî gelek caran bi belgeyan hatiye piştrastkirin jî.

Artêşa tirk bi derxistina van şewatanhewil dide di şerê li dijî gerîla de encam bigire. Ligel vê ji bo çavkaniya şêniyên herêmê yên mîna sewalkarî û cotkariyê jî tune bike û herêmê feqîr bike jî ev tê kirin. Bi vê re tê armanckirin ku dawî li jiyana zindiyên herêmê bînin, herêmê bêmirov bikin.

Di van demên dawî de gelek dîmenên leşkerên tirk ên daristanên herêmê dişewitînin û talan dikin hatin servîskirin. Ev rastî ji aliyê şêniyên herêmê ve tê zanîn. Gelek rêxistinên civaka sivîl jî ji bo balê bikşînin ser vî sûcî, xebat dan meşandin lê wek her car dozgeriya tirk dîsa kiryarên leşkerên tirk ji nedîtinê ve hat.

Li herêmê li gel van kiryarên artêşa tirk, ji bo dewlemendiyên binerd ên herêmê jî tevgerek heye. Di vê mijarê de raporên rêxistinên herêmê û navneteweyî amade kirine hene. Di raporan de bi awayekî berfireh behsa dewlemendiyên binerd ên herêma Dêrsimê tê kirin. Çi balkêş e ku cihên ku di raporan de behsa wan tê kirin, cihên ku şewat lê hene.

Îhaleyên qadên ku mîna herêmên madenên hatine pênasekirin, projeyên li ser herêmê pêş dikevin careke din nîşan dide ku dewleta tirk ji bilî armancên xwe yên leşkerî û ji bo armancên din daristanan dişewitîne.

Ev projeyên rantê, ku dibin sedema talankirina bêdadî ya xwezayê, ji Dêrsimê heta Cûdî ji Gabarê heta Şirnexê û heta başûrê Kurdistan û Rojava digihêje gelek deverên dagirkirî.

Têkildarî cihên madenê yên li Dêrsimê, şîrketa dewleta tirk Anadolu Madencîlîk û şîrketa kanan a navneteweyî ya Watts, Griffis û McOuat, di Îlona 2009'an de bi bin çavdêriya Dr. Robet H. de raporek amade kir. Di rapora ku hatiye amadekirin de der barê şewatên li daristanên Dêrsimê ku îro jî didomin, agahiyên girîng dide.

Hema hema hemû daristanên li bakurê Kurdistanê, nemaze daristanên Dêrsimê yên şewitîn, ew qadên ku di raporên navborî de hatine lêkolînkirin bûn.

Kesên di bin çavdêriya Dr. Robert H. Page rapora teftîşê amade kirin, di navbera 9 û 30'ê gulana 2009'an de diçin herêma Cevîzlîdereya Dêrsimê. Li vê herêma ku îro şewat lê heye nimûneyên madenê girtin. Li 26 deverên cûda xebatên sondajê dan meşandin. Di van sondajan de çavkaniyên madenî û cûreyên wan tespît kirin. Di rapora navborî de bi awayekî hûrgilî behsa dewlemendiya herêmê tê kirin.

Di nexşeya raporê de herêma Cevîzlîdere mîna qada Project hatiye diyarkirin. Şewata li herêmê jî herî zêde li vê qadê pêş dikeve. Her wiha di raporê de xebatên sondajê yên li herêma Dêrsimê hatine meşandin jî bi awayekî hûrgilî hatine vegotin û têkildarî dewlemendiyên wê agahî hatine parvekirin.

Dewleta tirk ji bo van çavnakiyên ser erd û bin erd ji îhaleyan re veke gav bi gav li herêmê xebat dide meşandin. Şewata daristanan jî parçeyekî vê xebata qirêj e.

Di çarçoveya vê planê de wek gava ewil daristanên herêma Alî Bogaz û derdora wê hatin şewitandin û talankirin. Piştre jî ji herêma Kozluca heya Cevîzlîdereyê girt nav xwe. Wisa diyare ku wê ev şewat ji van herêman jî heya herêmên Tanzi, Kâhperî û Bilgeç jî bandor bike.

Ev herêmên şewat lê derketine di rapora ku di bin çavdêriya Dr. Robert H. Page ku ji bo Şîrketa dewleta tirk ya bi navê Anadolu Madencîlîk, şîrketa bi navê Grîffis ve McOuat ya navnetewî amadekiribû digire nav xwe.

Li van herêmên ku di raporê de hatine destnîşankirin de gelek caran ji aliyê leşkerên tirk ve şewat hat derxistin. Ev şewat bi dîmenên ku leşkeran bi xwe kişandibûn jî hatibû belgekirin.

Di raporê de behsa herêma girê Amûtka jî tê kirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku li daristanên vê herêmê jî gelek caran şewat derket. Di encama lixwemikurhatinên leşkerên tirk de derketibû holê ku şewata li herêmê ji ber gulebarana leşkerên qereqola Amûtka derketibû.

Şêniyên herêmê wê demê jî ji bo mudexaleyî şewatê bikin ketin nav liv û tevgerê lê wek her carê dîsa ji aliyê leşkerên dewleta tirk ve hatin astengkirin.

Şewata li Dêrsimê careke din derxist holê ku agirên li daristanên Kurdistanê derdikevin ne ji xwe ye. Ji bo ku van herêman pêşkeşî alîgirê desthilatdariyê bên kirin wek çavkaniyek rantî tên dîtin. Lewma di çarçoveya vê rantê de, di şewata li herêmê de jî destê hin aliyan heye. Di vê îhaleya projeya rantê de şîrketên mîna Cengîz Holdîng û Lîmak jî di nav de 5 şîrketan îhale girtiye.

Li hemû cihên ku di raporê de hatine destnîşankirin, di pêşengiya van şîrketên nêzî desthilata AKP/MHP'ê ve ji bo şîrketên navneteweyî hatiye pêşkêşkirin. Ev jî derdixe holê ku şewata li daristanên Dêrsimê derketiye ne ji ber sedemên xwezayî, ji ber hesabên rantê ne. Lewma wek şêniyên Dêrsimê dibêjin "Dêrsim naşewite, tê şewitandin".

Tevgera Talîbanê çawa xwe fînanse dike

Li gorî texmînên Neteweyên Yekbûyî dahata Talîbanê di sala 2011'an de derdora 400 milyon dolar bû û di sala 2018'an de dahatên wê her çû zêdetir bûn û mehane gihîşt derdora 1.5 milyar dolarî

Navenda Nûçeyan

Tê texmînkirin ku tevgera Talîbanê yek ji tevgerên çekdar ên cîhanê ya herî zengîn e. Piştî 20 salan ji şer û pevçûnên dijwar ên bi hêzên DYA û hevkarên wê re Talîbanê çawa dikaribû xwe fînanse bike û ewqas lêçûnên şer û endamên tevgerê ji ku peyda dikirin?

Talîbanê di navbera salên 1996 û 2001'ê de desthilatdariya Afganistanê kiribû, piştî destwerdana hêzên navneteweyî û şerê 20 salan tevgera Talîbanê hem bi hejmara xwe û hem bi hebûnên di destê xwe de mezintir bû. Niha di navbera 70 heta 100 hezar endamên vê tevgerê hene ku berî destwerdana DYA û hêzên hevpeymanê hejmara wan derdora 30 hezar çekdarî bû.

Li gorî texmînên Neteweyên Yekbûyî hatinên tevgera Talîbanê di sala 2011'an de derdora 400 milyon dolar bû û di sala 2018'an de dahateyên wê zêde bûn û mehane giha derdora 1.5 milyar dolar.

Pergala baceyan

Li gorî rapor û hevdîtinên ku ji alî BBC'yê ve li derve û hundirê Afganistanê hatine amadekirin, pergaleke tevgera Talîbanê ya ferzkirin û daneheva baceyan heye. Yek ji van çavkaniyan pergala alîkariyan e, gelek kes ji Pakistan, Erebistana Siûdî, Îmaratên Erebî, Qeter û hin deverên din bênavber alîkarî didan vê tevgerê. Tevî ku gelekî zehmet e mirov bizanibe çiqas pere ji wan dihatin lê li gorî texmînan hatinên ji alîkariyan digihîje derdora 500 milyon dolarî.

Li gorî hin raporên istixbareta DYA'yê di sala 2008'an de derdora 106 milyon dolar ji aliyê hin welatên Kendavê ve alîkarî ji Talîbanê re hatiye şandin.

Bazirganiya madeyên hişbir

Her çendî tevgera Talîbanê vê tewanbariyê red jî dike ji gelek aliyan ve tê texmînkirin ku ev tevger bi rêya bazirganiya madeyên hişbir û afyonê gelek pereyan bi dest dixe. Salane li Afganistanê derdora 1.5 heta 3 milyar dolarî ji bazirganiya afyonê bidest dixe. Li gorî hin çavkaniyên afganî tevgera Talîbanê ji sedî 10 baceya xwe ji cotkar û bazirganên afyonê bidest dixist.

Baca ji afyonê

Dahateyên Talîbanê ji bazirganiya afyonê ji 100 heta 400 milyon dolarî ye. Tevgera Talîbanê ne tenê ji afyonê bac digirt, di sala 2018'an de bi nameyeke vekirî bang li bazirganan kir ku baceyên xwe yê gumrikê nedin kesekî din. Dema ku bazirgan di deverên di bin destê Talîbanê de derbas dibûn diviyabû ku baceyê bidin wan. Her wiha bi salan bace ji wesayît û kamyonên ku alîkarî dibirin ji hêzên navneteweyî re jî distandin. Wekî mînak serokê şirketa elektrîkê di sala 2018'an de dabû xuyakirin ku tevgera Talîbanê li deverên di bin kontrola xwe de dahateyên wê ji fatûreyên elektrîkê salane derdora 2 milyon dolar bû.

Ji aliyekî din ve erda Afganistanê bi madeyên hêja û kevirên heqîqî jî zengîn e. Ji wê derê jî Talîbanê hatinên mezin bidest dixistin. Her wiha li gorî rapora salane ya Neteweyên Yekbûyî, Talîbanê ji kanên ne fermî yên madenan salane derdora 10 milyon dolar bidest dixist.

Pentagon: Em ê alîkariya Pêncşêrê nekin

Herêma Pêncşêrê herêma bi tenê ya ku li derveyî kontrola tevgera Talîbanê maye. Piştî ku hevdîtinên di navbera serkêşê berxwedana Pêncşêrê û tevgera Talîbanê bê encam man û berxwedêran radestkirina herêma xwe red kirin, şer û pevçûnên dijwar di navbera çekdarên Talîbanê û parêzvanên Pêncşêrê de derketin.

Di van rojên derbasbûyî de herdu aliyan jî daxuyanî dan ku wan gelek çekdar ji hevdû kuştine. Lê daxuyaniya DYA'yê der barê van şer û pevçûnan de balkêş bû, wan da zanîn ku ew dê li dijî Talîbanê alîkariya hêzên Pêncşêrê nekin.

Berdevkê fermî yê Wezareta Karên Derve yê DYA'yê John Kerry da xuyakirin ku peywira wan a leşkerî li Afganistanê bi dawî bûye û ew dê alîkariyê nedin Eniya Berxwedana Neteweyî ya Afganistanê ya ku bi serkêşiya Ehmed Mesûd ku li dijî Talîbanê şer dike.

Her çendî ku erdnîgariya Pêncşêrê cihekî asê ye lê wekî ku di destpêkê de Ehmed Mesûd jî gotibû heke alîkariya wan neyê kirin dê nikaribin demeke dirêj şer bikin.

Nakokiya mezin li vir ew e ku li ba artêşa Afganistanê ya ku 20 salan piştgiriya wê hate kirin çekên giran hebûn lê îradeya berxwedanê tune bû. Niha jî li ba van berxwedêrên Pêncşêrê îradeyeke mezin a berxwedanê heye lê çekên wan kêm in û hêzên navneteweyî alîkariyê nadin wan.

Ji aliyekî din ve tevgera Talîbanê niha xwedî bi sedan balafir, tank, top û wesayitên zirxî ye ku artêşa DYA'yê û hevalbendên xwe yên NATO'yê li pey xwe hiştin.

Vîrûsa birçîbûnê ji 'Covid-19' tirsnaktir e

Kurdistan Lezgiyeva

Big Media her dem me bi karesatên cihêreng ên gerdûnî ditirsîne. Îro, du xetereyên sereke yên ji bo mirovahiyê di rêzên yekem de xuya dibin: vîrûsa COVID-19 û germbûna gerdûnî li ser planet. Tê bîra min ku di meha adara sala borî de, dema ku Rêxistina Tendirustiya Cîhanê (WHO) pandemiya COVID-19 ragihand, rayedarên vê rêxistinê gotin ku rêjeya mirina kesên bi vîrusê vegirtî dibe ku %3.4 be.

Bi awayek bêkêmasî, ev tê vê wateyê ku pandemiya heyî di warê jimara qurbanan de dikare ji 'grîba spanî' ya naskirî (serpêhatiyek gripê ku di salên 1918-1920'î de nêzîkê 50 mîlyon kesan jiyana xwe ji dest da) derbas bike.

Vê gavê, li gorî Zanîngeha Johns Hopkins, ku ji hêla Rêxistina Tendirustiyê ya Cîhanê (WHO) ve hatî pejirandin, hejmara giştî ya mirinên ji coronavirûsê li cîhanê 4.34 mîlyon kes in. Niha ez teqez dest nadim pirsa ka çiqas bi van hejmaran dikare were bawer kirin. Lê tewra jimareya jorîn destnîşan dike ku 'alarmîstên' sala borî rêjeya mirinê ya ku ji pandemiyê tê hêvîkirin bi fermanan zêde kiriye. Hêjayî gotinê ye ku danîna texmînên tirsnak ên mirinên pêşerojê yên ji coronavirûsê (û hem jî ji germbûna avhewayê), Big Media û gelek rayedarên WHO bala xwe nedan wan mirinên ku 'li vir û niha' diqewimin. Mînak, WHO vê dawiyê texmînek mirinên zêde li cîhanê di dawiya sala 2020'î de weşand.

Em qala zêdebûna rêjeya mirinê ya sala borî li gorî sala berîya wê dikin. Rêjeya mirinê ya zêde 3 mîlyon bû. Hejmara giştî ya mirinên ji COVID-19'yê sala borî gihîşt 1.8 mîlyon mirovî. Mirina zêde ya sala çûyî bi wê ve hate girêdan. Lê dîsa jî 1,2 mîlyon mirinên mirovî hene ku ji hêla sedemek diyarkirî ve nayên vegirtin, sedema wan hîn ji hêla WHO'yê ve bi zelalî nehatiye aşkerakirin. Di rastiyê de, WHO texmîna mirina zêde ya 3 mîlyonî rêjeya mirinê pir kêm dike. Pispor hene ku dibêjin hejmarên mirinê 6-8 mîlyon in. WHO'yê bala cîhanê kişand ser 'pandemiyê' û her tiştê din ji çarçoveyê derket. Lê li pişt perdeyê gelek tiştên balkêş û tirsnak hene.

Pir hindik pisporan bal kişandine ser sedemên mirinê yên ne-COVID-19. Di nav van sedeman de, dibe ku cîhê yekem birçîbûna li cîhanê ye. Werin em li ser vê gefa mezinbûyî biaxivin.

Ez dixwazim bala we bikşînim ser wê yekê ku mijara 'birçîbûn' û 'kêmxwarin' di rojeva gelek rêxistinên navneteweyî de berdewam e. Wekî UNICEF (Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî), Bernameya Xwarinê ya Cîhanî ya Neteweyên Yekbûyî (UNWFP), FAO (Rêxistina Çandiniyê, Fona Navneteweyî ji bo Pêşketina Çandîniyê (IFAD), WHO (Rêxistina Tendirustiyê ya Cîhanî). Lê di heman demê de, birçîbûna li cîhanê di serî de wekî pirsgirêkek sosyo-aborî tê dîtin. Aliyek wisa sereke ya pirsgirêkê wekî mirina ji ber birçîbûn û birçîbûnê ya domdar ji navendê dûr e. Di têgihîştina WHO'yê de jî ev heye. Ji ber ku rêxistinên navneteweyî yên cihêreng ji bo tiştên ku wekî 'birçîbûn' têne hesibandin pîvanên wan ên yekbûyî tune, di statîstîkên wan de cudahiyek mezin heye.

Di sala 2020'î de, hejandineke tûj hebû - hêjmara mirovên birçî di salekê de zêdetirî 80 mîlyon mirovî zêde bû (%11,6). Û para wan di giştiya nifûsa erdê de hema hema gihîştiye %10. Di rapora FAO'yê de, sedema vê hejandinê bi girtina aboriyên gelek welatên cîhanê, daketina Berhema Navxweyî ya Giştî (GDP) ya cîhanê û windakirina kar û dahatan tê rave kirin.

Li vir pirsek pir girîng derdikeve holê: Li ser hejmara kesên birçî statîstîk hene (her çend pir nakok be jî), lê gelo îstatîstîkên kesên ku ji birçîbûnê dimirin hene? Wekî ku tê xuyakirin yek rêxistinek navneteweyî xwedan statîstîkên wisa nîne. Ya WHO'yê jî tune ye. Karbidestên WHO vê pir bi hêsanî rave dikin: em çawa dikarin mirinên ji birçîbûnê bihesibînin, heger teşhîsên bijîşkî 'ji birçîbûnê mirî' tune bin?

Erê, ew kes ji birçîbûnê mirî ye lê ew ê bi yekî din were teşhîskirin. Ango li heman Afrîkayê ku nihêrîna tenduristî û bijîşk xirabin dibe ku ew bi tevahî teşhîs nekin. Ew ên mirin jî nayê qeydkirin. Bi kurtasî, niha metodolojî yan jî mekanîzmayek ji bo tomarkirina mirinên ji birçîbûnê tune ye. Û ji ber ku statîstîkên mirinên ji birçîbûnê tune ne wê demê pirsgirêk jî tune ne. Ev ne statîstîkên nexweşî û mirina ji coronavirûsê ne.

Di vê rewşê de, her kes di bin 'çeka' çavdêriya bijîşkî de ye. Heta li Afrîka jî, statîstîkên bûyer û mirinên ji COVID-19'yê hatine sererastkirin. Lê ji ber hin sedeman, rayedarên WHO û saziyên din ên pispor ên Neteweyên Yekbûyî mixabin nafikirin ku tomara miriyan bi teşhîsa 'ji birçîbûnê miriye' saz bikin.

Ji bo rizgarkirina mirovên li çar aliyê cîhanê tenê 5 mîlyar dolar hewce ye ku were dîtin. Heyf e, di alîkariya pratîkî de, di civînên lûtkeyê û rêxistinên darayî yên navneteweyî de pirsa alîkariyek wisa nayê kirin. Ew ji tiştek din ditirsin: pêdivî ye ku ew 100 mîlyar dolar bibînin da ku alîkariya welatên pêşketî bikin ku dermankirina (vaksînaşı) gerdûnî bi dest bixin.

Di wêjeyê de serdestiya pazû û simbêlan

Elîf Gun

Civakên ku di hêla wêje û filozofiyê de paş ve bimînin di dîrokê de jî hebûna xwe nikarin ava bikin û dîroka wan jî nayê nivîsandin. Ziman û wêje, dîrok û hebûn bi xwe ne. Çima jin di felsefe û wêjeyê de jî kêm in? Ev mijar duh jî pirsgirêk bû, îro jî pirsgirêk e û wê sibê jî bibe pirsgirêk. Her wiha ji bo pêşerojê jî em bibêjin 'belkî' û hêviyên xwe qut nekin.

Di wêjeyê de, dengên jinan li Ewropayê 1920'î de bilind bû, li Tirkiyeyê jî piştî salên heftêyî (1970) dengên nivîskarên jin hatin bihîstin. Dengê niviskarên jin ên kurd, qet em nebêjin, ji ber ku derdekî giran e. Lê li qada her birêvebirin û gerînendetiyê de dagirkeriya pazûyan û simbêlên mêran jin her tim wekî obje didît û hê jî dibînin. Ji ber di pexşanê de jinên kurd pir kêm in her wiha ji pênc tiliyan derbas nabin her tim mêrên bisimbêl li ser wan axivîn û hê jî diaxivin. Sedemeke din heye nebûna rexnegir, lêkolînerên jin jî dibe pirsgirêk. Wêje tenduristiya derûnnasiya civakê ye, dîroka heqîqetê bi xwe ye; gelo di vê dîroka heqîqetê de ya ku di destê mêran de ye, mêr di roman û çîrokên xwe de çawa li jinan dinêrin, karakterên xwe çawa ava dikin? Tespîteke muhîm ya femînîzmê jî ew e ku 'Jin bi mecbûrî di zimanekî ku ji hêla mêran ve hatiye çêkirin de dijîn.'

Di wêjeya kurdî û ya cîhanê de bi gelemperî lehengên jin bi zimanekî pederşahî hatine afirandin. Di wêjeya kurdî de em rastî jinên wisa tên ku nivîskaran nehiştiye ew jin tu carî azad bibin ew her tim bindest in. Di nava civakeke wisa de dijîn ku jin tenê wekî amûr in, wekî tişt dixuyên. Ji bo wêjeya bisimbêl baş were famkirin û aşkerakirin em ê li ser du nivîskaran û du berhemên cuda rawestin. Romana Mehmed Uzun 'Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê' û Çîroka Firat Cewerî ya bi navê 'Kevoka Spî'. Di her du berheman de jî navên lehengên wan 'Kevok' in.

Mijarên herdu berheman

Romana Mehmed Uzun 'Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê' di sala 1998'an de ji Weşanxaneya Avestayê hatiye weşandin. Bûyer li der û dora lehengên bi navên Baz û Kevok hatine hunandin. Baz. Kevok. Em ê ji yekî re bibêjin Baz, ji ya din re jî bibêjin Kevok. Baz û Kevok. Du nav, du însan; zilamekî navsalî û jineke ciwan. Du nav, du însanên sereke yên romana me. Romana me dê qala serboriya Baz û Kevokê bike.

Çîroka Firat Cewerî 'Kevoka Spî' cara yekem di sala 1989'an de di hejmara 31'ê ya Kovara Nûdemê de, hatiye çapkirin. Çîrok behsa ciwanekî dike ku xweha wî bi hezkiriyê xwe re direve û ji ber vê sedemê ew xwişka xwe dikuje. Ji ber vê yekê 15 salan di girtîgehê de dimîne. Di girtîgehê de ji ber kuştina xweha xwe poşman dibe, her wiha fikir û ramanên wî di wan pazdeh salan de tên guhertin. Kuştina xwişka wî ji her alî ve tesîreke mezin li ser derûniya serleheng dike.

Her wiha di dawiya çîrokê de serleheng xwe dikuje. Di çîrokê de xweha serleheng dikeve sîmayê kevokeke spî, bi afiradineke zarokane û stîla xeberoşkan wisa tê cem birayê xwe. Em dibînin ku di çîrokê de ya herî hatiye pelçiqandin jin e. Birayê wê tenê dibe qurbanê qebûlên civakî, lê belê Kevoka Spî dibe qurbana civaka pederşahiyê. Di çîrokê de naskirina jinan bi rolên wan ên civakî û çandî re di teşeya objektîfbûn û bindestiyê de ye. Bi rastî tirs di hewldana wan ya azakirinê de wan felç dike.

Di wêjeya kurdî û ya cîhanê de bi gelemperî lehengên jin bi zimanekî pederşahî hatine afirandin. Di wêjeya kurdî de em rastî jinên wisa tên ku nivîskaran nehiştiye ew jin tu carî azad bibin, ew her tim bindest in, di nava civakeke wisa de dijîn



Li aliyê din, Kevoka Spî li ser vê yekê sekiniye ku afirîneriyek xurt ya mêr û afirîneriyek qels ya jinê hewce ye û divê jin werin parastin. Ew di wateya addictionê de û parastina ku di çîrokê de hatiye îfadekirin tê bikaranîn, yanî hizir ew e ku jin bi mêr ve girêdayî ye û windakirina takekesî ya jinê, ango jêrdestî ye. Kevoka Spî di çîrokê de mecbûrî tenêtiyê dibe. Dema ku em di çîrokê de li herka hişî ya jinê binihêrin; reşbînî û hesta veqetandî ya ku hezkirî û birayê Kevoka Spî, dijîn û hîs dikin, atmosfera giştî ya çîrokê radixe ber çavan. Jin ji rastiya xwe agahdar dibe, lê di heman demê de fêhm dike ku ew nikare di vê pergalê de bijî. Lê belê dîsa jî ew jiyana xwe naguherîne û bêhêvî li bendê ye ku birayê wê bê wê bikuje. Ji ber vê yekê di dawiya çîrokê de nêrîneke reşbîn serdest dibe. Jin her gav di civakê de li derdora xwe belav bûne. Ji ber dermankirina ku jinan di civakê de dîtine jin tu carî xwe bi tevahî aîdî cihekî hîs nakin. Nivîskar, lehengên mêr xwedî zagon û maf dibîne. Her wiha lehengên mêr wekî axayê civakê û qesrê û jin jî wekî kesayetên ku di çarçoveya pêşkêşkirina kesên ji wî re xizmetê dikin, nîşan daye. Ji ber ku jin û mêr hem mecbûr in peywirên ku ji hêla civakê ve ji wan re hatine dayîn bi cih bînin û hem jî jin neçar in ku ji nîzama baviksalariya hatiye sazkirin ji roja hatiye dinê ve bi cih bîne. Ji ber vê sedemê, xwedîtiya mêran serbilind dike û ew ji bo rola xwe ya zayendê ve guncav e. Bira her çiqas nexwaze xweha xwe bikuje jî qebûlên civakî wî mecbûrî vê yekê dike. Rêgezên hişk yên civaka baviksalariyê hene. Bavên ku xwe wekî berpirsiyariya 'jin û keçê' qebûl dikin heya keçên xwe didin zilamekî, wê jinê diparêzin. Her wiha wê 'jinê' wekî amûrekê bi kar tînin da ku di bin çavdêriya mêr û birayên wê de bigirin. Heger jin xeletiyê bike yan li hemberî wan serî rake hingê ji aliyê mêran ve bi tundî tên rawestandin. Wek tevger bi gelemperî, kodên şêwaza cinsî gihîştina qada giştî ya jinê û vê yekê sînordar dikin.

Lehengên jin û nêrînên nêrane

Bi taybetî di avakirina lehengên jin yên her du berheman de nêrînên nêrane teşe girtine. Ev jinên ku di her du berheman de dixuyên yanî Kevoka Spî û Kevok, jinên ku di hişmendî û binhişa nivîskar ve girêdayî ne. Helbet nivîskar aîdî erdnîgarî, civak û hişmendiyekê ye. Di civaka baviksalar de jin, di nav rolên zayendê de û bi zimanekî nêrane hatine hepiskirin. Jin di nav van sînorên ku jê re hatiye danîn de, bûye xwedî nasname. Gava em bala xwe didin her du nivîskaran, taybetiyên baviksalariyê bi awayekî xurt xwe di nav metnên wan de bi cih kiriye. Cewerî û Uzun, lehengên xwe yên jin li gorî dilên xwe afirandine. Lehenga jin Kevoka Spî bêhtir bi zayenda xwe ve derketiye pêş û bêhtir karê objeyekê, amûrekê û tişteyekî girtiye ser xwe.

Dema em li 'Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê' mêze dikin Kevok, keçeke şervan e, ji welatê xwe yî dagirkirî tê dikeve hembêza efserekî artêşa tirk. Şervaneke jin çawa ji dagirkerê xwe hez dike? Gelo ji bo welatê xwe ji dagirkeran rizgar bike şer nedikir? Gelo her du nivîskarên me çima van her du lehengên jin afirandine? Di bin bîra her du nivîskaran de jî muhtaciya erênî ya dagirkeriyê heye, her du jî bi rihê xwe ne azad in û xwe dispêrin sîstema dagirkeriyê. Çima jinên zîrek û berhemdar nabin mijara wan? Uzun keçeke kurd û şervan, Kevokê bi evîneke kûr, di nav pêlên hezkirina efendiyê xwe de -ku efendî serdest in- dide qebûlkirin. Psîkolojiya dagirkeriyê ya veşartî di bin hişê nivîskar de xwe aşkera dike. Sedemê eşqa Baz û Kevokê xwe di vir de dide der. Efserê tirk Baz, xwînmij, kujer, zilmdar bi çi qismetê paşê rehm dikeve dilê wî, lê belê her daîm yên bindest li benda rehma efendiyê xwe ne. Dîsa jî radibe keçeke şervan û kurd dike evîndara wî. Mijara romanê jî balkêş e helbet. Roman li ser dagirkirina Kurdistanê û şerê azadiya kurdan e. Lê belê aqil û hişê kolonyalîzmê, qebûlkirina efendiyên xwe dihêle ku şervaneke jin dev ji doza xwe berde û bibe evîndara efendiyê xwe. Gava em li 'Kevoka Spî' jî dinihêrin di civakeke baviksalar de dijî û nivîskar, pergala baviksalariyê û nêrînên xwe yên mêrane nîşanî xwendevanên xwe dide. Helbet nivîskar, ji nav civaka kurd derketiye, her çiqas wekî kesekî pêşverû û rewşenbîr xuya bibe jî xwe ji zihniyeta nêrane xelas nekiriye. Bi zanebûn an bê zanebûn, jinên ku bi pênûsa wan afirîne di nav zihniyet û zimanekî nêrane de, bi sînorkirî ne. Lehengên jin ku di çîrokê de û di romanên derketine pêşberî xwendevan de, bi perspektîfên nivîskaran dirûv girtine.

Namûs û evîna efserê tirk

Di 'Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê' de hezkirin li hemberî efendiyê xwe ye û di xwe de qebûlkirina civaka efendiyê xwe dihewîne. "Pergala Kolonyalîzmê ji bo berdewamkirina talanê hewceyî mekanîzmayê ye. Her çiqas dagirker welatekî zeft bikin, yanî têxin destê xwe jî serhildan tirsa di dilên dagirkeran de ye. Lewma kolonyalîzm dixwaze bikeve nav giyan û aqlên kesan. Dagirkerî ji bo konsolîdasyonê konê xwe ne tenê li ser welêt lê li ser aqlên mirovan jî vedigire. Kolonyalîzm ji mirovên xulam re yên ku hatine dehumanîzekirin/insaniyeta wan hatiye jihevxistin aqlê protez peyda dike. Ew aqlê protez hatiye programkirin û sinorên wî jî belî ne. Êdî xwediyê aqlê protez di bin bîra desthildaran de ye û benê xwe jî bi destê dagirkeran ve berdaye. Aqlê protez aqlê kedî ye, serê xwe ranake." Uzun, ji bo ku xwe bi wêjeya tirkî û tirkan bide qebûlkirin an xwe bike nava wan evîna xwe ya veşartî hemberî efendiyê xwe bi eşqa Kevok û Baz dide nîşandan. Yanî, serdest dikarin her tiştî bikin, axa me ji me bistînin û em jî radibin doza xwe berdidin û ji bo dagirkirina welatê xwe ji dijminê xwe hezdikin.

Encam

'Kevoka Spî' bi wesfên mîna; xweşik, malxerab, naîf, qels, stûxwar hwd. hatiye afirandin û ravekirin. 'Kevoka Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê' jî xweşik û naîf hatiye afirandin û şayesandin. Yanî mêran çawa xwestine wisa şayesandine. Zayenda jinê di her du berheman de ji bo têkiliya cinsî wekî biwareke hêz û desthilatdariyê yan jî mêraniyê tê dîtin.

Tolstoy û Flaubert jî di romanên xwe de lehengên xwe dikujin, mîna ku ji Karanina û Madam Bovary re dibêjin ku hûn dil bigirin, wek mêran tevbigerin û rêgeziya civakê bela wela bikin, wê xwedê bela we bide, kuştin jî heqê we ye. Dagirker çawa serdestî û hukimdariya xwe ava dike, niviskarên mêr jî bi afirandina karakterên xwe, bi hişmendiya dagirkeran diafirînin. Dema em di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê de li lehenga jin Kevokê dinihêrin, keçeke xwende, ji bo hezkiriyê xwe diçe ser çiyê, dû re tu dibêjî qey Kevok mîna gerokekê ye û çûye ji xwe re bigere, dikeve destê artêşa tirk, mîrzayê hespê boz Baz ku kujer û xwînmijê welatê wê ye, tê wê xelas dike û ji destê serdestan dibe cihekî dûr. Di dawiyê de birayê Kevoka Spî întîhar dike. Çi dibe dema ku birayê Kevoka Spî xwe dikuje; serdestiyeke yekalî jî dikuje.

Firat Cewerî û Mehmed Uzun berhemên xwe bi hişmendiyeke mêrane nivîsandine. Di van her du berheman de nêrîna baviksalar ya li ser jinê, li ser nêrîna karakterên mêr jî hatiye analîzkirin û zîhniyeta mêrserwer baş tê berçavên me. Bi kurtasî di çîroka Cewerî û di romana Uzun de, em dibînin ku binhişê wan, realîteya wan bi xwe ye. Bi salan li Ewropayê bijîn jî xwe ji civaka baviksalar û hişmediya mêrane azad nakin. Lewma fikir û ramanên her du nivîskaran qet neguhêrîne û bi hêsanî jî naguhere. Gava niviskarên mêr bi xwezayî û ji dil lehengên jin bêyî bandor, bêyî otosansûr ava kirin, wê gavê em dikarin bibêjin pazû û simbêlan serdestiyê ji pênûs û tiliyan nestandiye. Hêviya me ev e ku bila niviskarên mêr, di bin siya nefs û quretiya simbêl û pazûyên xwe de nenivîsin û neafirînin. De werin meydanê!

Tarixê kurdan rê dismenî

Meral Ozel

Dismenîya vera şarê kurdî de xoza zî hedef girîyena. Faşîzmî ra kemer û kuç, dar û ber, teyrudur kî para xo gênî. Nê çemî azad herikîyenê, nê kî darî benê gewe, nê kî mircikê sey zerya xo wanenê. Dismenîya dewlete înan sero ra xo eskera kena. Welatê ma, hardo ke kamayîsê ma vejîyo werte, hardo ke pîlema tey weşîya xo ramite werte adir de ro. Zorvajîya henena bi serranê peynîya xo nîna. Însanan qir kerdî, estê zerrê, bi hezaran kerdê muxacîr û onca kî nêvindene.

Îqtîdarê AKPyî bi polîtîkayanê lej û rantî, xozaya Kurdîstanî kena xan û xirabe. Eynî waxtî de ciwîyayîşê şarî, kultur û vîrra qom yena hedef girewtene. Bi plananê lejî kurdî hardê xo ra benê. Pêro tarîxê şaranê ke Mezopotamya de ciwîyenê, wazenê rêca înan hard serd de nêmano. Nameyê kurdan sero çik esto hedef cenê, çik ke kultur û tarîxê kurdan ano mordem vîrrî riznenê ya kî name vurnenê. Wazenê azê kurdan kokî ra bibirnê.

Lejê qirkerdene, xoza sero, dar û ber sero kî yena ramitene. Serva dewan tol kerdene her ca de xoza vesnenê. Bi zanayîs, bi gore polîtîkayanê talan, lej, nê darî yenê vesnayene. Şirnex ra heta Çewlîg, Bedlîs, Dêrsimî adir kewte birran. Cayêko sey Şirnex adir nêkewto, birr yenê birnayene. Fermanê kok ardena birran ameyo dayene. Fermanê talan, riznayene, xan û xirabe kerdena hardê ma ameyo dayene.

Polîtîkayê înkar û asîmîlasyon, dewam kenê. Hukmat pêro dek û dolabênê xo qomî ser ferz keno. Rayanê newe vînenê seweta kokê kurdan ardene. Mavenê nê rayan de namê dewlemendîye, namê girs biyayena, cayê turîzmî, sukan talan kenê, kultur werte ra daranê we. Dêrsim de kî na raya her kes gorê xo jû gucike na talan ra pêgirewto. Bi desan madenî suke de estî, koyê Munzur kî maven de her koyê ser her pûlî ser projeyî estî. Serva nê madenan rakerî, raver hard kenê tol, vesnenê, însanan no talankerdişî rê kenê bêveng. Serva vurnayîsî azê qomê Dêrsimî, polîtîkayê lejê taybet ke dewam kenê. Herema Dêrsimî de hem kamayisî kurdî hem kî îtîqatê şarî xo rê kerdê hedef. Dêrsim vatene xoverdayene, vernîya zilm û zorvajîye de vinetena. Dêrsim vatenê îtîqatê Raya Haqî

Îtîqatê Raya Haqî vatene, jiyar û diyar, hardê Dewres, Dêrsim vatena. Xoza, daruber pêro pîya zerrê na îtîqatî de pîya yenê ziwan ardene. Dêrsim bi xo namê kultur, tarîx û kirmancîyo. Îqtîdarî tim Dêrsim kerdê çimê xo, estê kamîya na hardî ser. Hama îqtîdarî ewroyîn serva ke planê rejîmê neweyî kenê, jê pêro welat Dêrsim vernîya xo de xete vînenê. Coka her hetî ra serva tol kerdena kamayîsî namê Dêrsimî herîş kenê. Eke vernîya pêro nê talanî nêame girewtene, her cayê Dêrsimî de madenî berê rakerdene, dewî rîwalî nê madenan ra tol bibe, însanî reya de bînî bikuyî rayan. Welatê ma jûbîn rê giredana, roj bi roj lete bi lete talan kenê, nika ra kerdê çeberê rantî. Nejdî de beno ke hînî ra awa simitene nêro simitene. Şiya dare rê hesret bimanê.

Kesê ke bêveng manenê hemkarê talankerdişî yî

Herêma Çelênimêja û Bestayî yê Şirnexî qirkerdişê daran o ke hetê dewlete ra bi destê qorîcîyan yeno, dewam keno. Heta nika herême de bi hezaran darî ameyî birnayene. Darê ke yenê birnayene bi qamyonan yenê barkerdene û şirawîyenê tebere bajarî. Welatîyê herême yê ke darê înan bê xebera înan yenê birnayene Mudirîya Daristanî, Walîtîya Şirnexî û qereqolê herême rê waştişnameyêk şirawitî. Welatîyê herême qorîcî û leşkeran gerre kerdî. Waştişnameyo ke ame şirawitene de ame vatene ke herêma înan de problemê asayîşî çinî yo û ame waştene ke herême de birnayîşê daran bêro vindarnayene.

Welatîyê ke gerre kerdî ra Ahmet Îrmez dîyar kerd ke birnayîşê daran merdimîye û wijdanî nîyo û vat: "Herêma Çemê Gird ê Besta de erdê ma esto. Qaseyê seyan serran emrê daranê herême esto. Ma debara xo pê na herême kenê. Ma ewja de heywananê xo weye kenê. Eke xoza şêra do çi binamo? Herêma ma de talan dîyayo destpêkerdene. Eyb o, guna yo. Eke wina dewam bikero herême de do heywan nêmano. Ma waştişname şirawit, la ma rê ame vatene ke leşkerî vano ke ma do qaseyê hezar metre dar bibirnî. Dar cuye û nefesê ma ya. Wa darê ma nêbirnî."

Meryem Îrmez



Ahmet Îrmez

Metîn Uysal

'Hîna zêde veng'

Metîn Uysalo ke erdê ci zî herême de esto reaksîyon nîşanê talankerdişê xozaye da û vat: "Kesê ke bêveng manenê hemkarê talankerdişî yî. Polîtîkayê şer ê dewlete demêko dergo ke Şirnex de yeno rayraberdene. No şer çar hetan ra dewam keno. Seba amacanê xo yê lêşinan daristananê ma veşnenê. Ma ra destur nêame waştene. Besta ma rê qedexe yo. Seba ke merdim şêro Besta ganî ya merdim qorîcî bo û ya zî hemkarê dewlete bo. Reaksîyonê ke yenê nawitene qîm nêkenê. Ganî hîna zêde veng bêro vetene."

'Tena daran nêbirnenê'

Tewr peynî welatîya bi nameyê Meryem Îrmeze qisey kerde û vat: "Heqê dewlete çin a ke xozaya ma talan bikera. Birnayîşê her darêk qetlîyam o. Şewatê daristanan û birnayîşê daran guna yo. Dinya tena şew û roje nîya, do dewam bikera. Wexto ke ma vînenê daran bi qamyonan bar kenê û benê, zerrîya ma dejena. Debara şarê herême Besta ya. Kam cayê dinya de darêk bêra birnayene ma vera ci de vindenê. Bi hezaran hêlînî serê daran de estî. Bi hezaran hinge estî. Tena daran nêbirnenê. Ê benê qatilê heywanan zî. Ma muracat kerd. Ma umud kenê ke netîceyêk baş bibo." ***ŞIRNEX***

Gelîya Çapakçurî girîya îhale

Texrîbatê xozayî ge şewat ge zî rant, her hetan ra dewam keno. Gelîya Çapakçurî ya Çewlîgî bî hedefe selahîyetdaran û projeyo ke îhale rê ame akerdene de Gelîya Çapakçurî do biba baxçeyê miletî. Serekîya Îdareya Konutanê Komî ya Serektîya Şaristanî û Dorme (TOKÎ) da zanayene ke Gelîya Çapakçurî 22ê êlula 2021î de îhale rê bêra akerdene û biba baxçeyê miletî. Goreyê eşkerayîya ke ame dayene do 130 hezar metrekare erd bêro îstîmlaqkerdene û mesrefê îstîmlaqkerdişî ra 10 mîlyon hetê serekîye ra û ê bîn zî hetê şaredarîye ra bêro temînkerdene. Eşkerayî de ame vatene ke do demêk kilm de hetê Mudirîya Şaristanî û Dorme ra komîsyonêk bêro awankerdene û no komîsyon demêk kild de dest bi xebatan bikero.

TOKÎ çarçeweya projeyî de do merkeze Çewlîgî de dest bi viraştişê baxçeyê miletî bikero. Bado ke pêkerdişê cayî bêro îmzakerdene do mîyanê 10 rojan de xebatê viraştişî bidîyê destpêkerdene û goreyê projeyî do 450 rojan de baxçe temam bibo. ***ÇEWLÎG***

Dewey Ma
Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

Hîkayeya weremî

Na hîkaye kamî vata, kînga vata ez nêzana. Na hîkaye çiya ameya vatişî, kamî nuşta ez aye zî nêzana. Na hîkaye raşt a, yan zî çiqas raşt a, helbet hayîya ma aye ra zî çinîya. Xora merdim pers nêkeno ke hîkaye çiqas raşt a, yan raşt nîya? Hîkayeya ma derheqê weremî de ya. Bêrê ma pîya bewnî ci ra.

Vanê wextêk serê rîyê dinya de nêweşîya weremî vejîya. Werem ame verê henî merdiman û va:

- Ez do heta Iraqî şêra. Heta ez şêra ewja û ageyra ez do 5 hezar merdiman bikişa.

Vanê înan zî vato; "Temam. De şore û bêre."

Vanê werem kewt rayîr. Dew bi dew, qeza bi qeza, bajar bi bajar şî û şî heta resa Iraqî. Demêk ewja de mend. Karê xo temam kerd û dima ra ageyra. Vanê wexto ke werem ageyra, nê 5 hezar tenî, tam bi temamî 50 hezar tenan kişte bî. Vanê geyray ro weremî û ci ra pers kerdê:

- "Ka to va ez do şorî û heta ageyrî ez do 5 hezar tenan bikişa. To çi rê 50 hezar merdiman kişt? Heyfê înan nêbî?"

Vanê weremî va:

- "Wele mi tena 5 hezar merdimî kiştî..."

- Çawey to tenî 5 hezar merdimî kiştî. 50 hezar merdim merdo, ê bînî senî merdî?

Vanê weremî bersiv dayo û vato:

- "Wele mi tena 5 hezar merdimî kiştî, la ê 45 hezarê bînî tersayî, kewtî tatêle mergî û xo vera merdî. Mi înan nêkiştî."

Rewşa ma însanan enka dinya de wina ya. No yew serr û nîme yo Covîd-19 dinya ro bîyo vila. Heme welatan de însanî no vîrsî vera mirenê. Belkî zehfê înan sey hîkayeya ma ya tersî vera mirenê. La ma gere bizanê ke wexto nêweşî vejîya meydan nîmeyê nêweşî bi dermanan û nîme zî bi moral çareser beno. Wexto ke merdim bê moral bo û biterso xora çareserî çinî ya.

Nameyê hîkayeya mi: 13'ê aşma 8'inan de tîney bedenê mi bî zêdî. La zêde çîkey mi çinêbî. Hema ana, mi va ez şorî test bidî. Ez şîya, doktorî test giret û va; "Kek Cemîl go çîkey to çinêbo." Ez bi ene rehetî ageyraya keye.

Roja bîn, yanê 14'ê aşme de encamê testî vejîya. Wezaretê Weşîye ra geyrayî û vatî; "Ti pozîtîf ê. Gere ti 14 rojan karantîna de bî." Bi ene xebere ra dima moralê mi xerepîya, la ca de mi no ters serê xo ra eşt.

Wezaretî hebî şirawit. Tarîxê nê heban derbas bîbî. Mi ê nêwerdî. Ez heta 27'ê aşme karantîna de bîya. Mi qe moralê xo nêxerepna. Ez baş ewnîyaya xo ra. Mi henî çî werdî, helbet vîtamîn zî. Mi keye de her heretan kerd, ez zêde nê nişta ro, mi xo zêde nê eşt erd û bê ke ez zêde bideja mi mesela hel kerd.

Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

1-Tiştek min heye
Dike û nake têr naxwe
Gelo ew çi ye?

2-Tiştek min heye
Mamê mino
Dikeve avê lê şil nabe
Kî dizane ew çi ye?

Çavkanî: Mamikên Botanê Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Bersivên me ev in:
1- Qijik, qiraik **2-** Tav, roj

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.
De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bibêje:
Çil çûrên çîqrût di nêv avê de

→ Heke nikaribî wê bibêjî ka vê biceribîne:
Dano dan da conî
Mîrkut gum da conî

→ Heke ew jî nebû dê sedî sed ev çêbibe:
Çi di hûr da
Çi di tûr da

Çavkanî: Zûgotinok
Berhevkar: Mihemedê Kurdo

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Gelek, zahf 3. Alaveke şer a kevnar 5. Du jinên ku bi heman mêrî re zewicandî dibin çi ye hev? 6. Kurtenavê Rêxistina Hevpeymanan ya Bakurê Atlantîkê
7. Balendeyeke kedî herî zêde li Qersê tê xwedîkirin
9. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê 12. Navekî kurdî yê kuran
14. Pêvek 15. Mirovê bi rik û înyad
17. Çi kes 18. Bersiva neyênî 22. Firoke

JI JOR BER BI JÊR

1. Rêxistineke navneteweyî ya nivîskaran
2. Aheng 3. Mûyê çena mêran
4. Noteke mûzîkê
5. Biçe (di rewşa fermanê de)
7. Navmalî, xizmetkar
10. Înyad 11. Henek
13. Bawerî
14. Leşkerî
16. Dengên bi aheng
19. Zeviya ne bejî ya ku tê avdan
20. Zebeşê ku hîna ne gihaye û nava wî sor nebûye
21. Agir
23. Celebê dareke Kurdistanê, an jî jina ku hevserê wê miriye

Bersiva hefteya borî

Kewê Redkan

Bûka mala me

Heta niha me çend bûk anîne, hemû jî weke xanima li ber mala xwe û halê xwe sekinîne, ji xwe re mal ava kirine, zarokên xwe dane xwendinê û mezin kirine. Ya herî baş jî malên xwe fireh û mezin kirine. Ji xwe re cîranên baş hilbijartine, xwe bi hemû kesan dane hezkirinê.

Lê bûka mala me ji gundê çiyayî hatî ye, ew li gundekî di nava çiyayan de mezin bûye, li wî gundê ku ew lê mezin bûye, tenê tu dikarî li ser pişta hespan an jî li ser pişta keran biçî wir. Wekî din rê û mê tune ne. Bûka me jî di nava rewşeke wisa de mezin bûye û her tim çavên wê li der û doran e, cîrantiya wê û hevalbendiya wê xweş e, devliken û bi rûmet e. Mala xwe û zarokên xwe ji hemû kesan zêdetir diparêze, weke mirîşkek li ser kurka xwe û hêkên xwe hemûyan diparêze. Ez wê tu carê biçûk û bêrûmet nabînim, ji ber ku ew wisa mezin bûye di nava gundên çiyan de. Lê niha li bajêr e, mala xwesî û xezûrê wê li bajêr e, ew bi bûkanî hat bajêr, xwişka min a mezin her tim ji me zêdetir li wê xwedî derdikeve û diparêze.

Ew bûkên hemû der û cîranan jê re hevaltiyeke baş dikin, hinek bûkên cîranan zêdetir xeybên xesiyên xwe dikin û dixwazin ew jî xeyba bike, lê tu carê guh nade gotinên wan.

Wan rojên hanê, em hemû bi dengekî tevlihev derketin ber derî, me dît bûka me bûka cîranê me avêtiye nava herqê, (ew herka avê di navbera mala me û mala cîranên me re derbas dibe) bi pêhîna lê dixe, destê xwe avêtiye koka guliyên bûka belengaz, nahêle ew jinik bersiva xwe bide.

Em bi hev re çûn hewara wan, bi destê zorê me ew ji hevûdu veqetandin, bûka cîrana me xwe avêt paş diya min, lê bûka me nasekine, em nikarin wê zeft bikin. Hema dibêje; min berdin, ez ê guliyên wê ji kokê ve rakim. Bi destê zorê me ew ji hev veqetandin, ka bêjin mesela we çî ye?

Bûka me got; Eva qûn bi erdê re nahêle zarokên min bikevin nav ava herqê, bi keviran li zarokên min xistîye, dibêje ev av a me ye, bila zarokên te nekevin nava ava me.

Hûn hemû jî dizanin ev av ji çiyan tê, ava bavê kesekî nîne, hemû kes dikare vê avê ji xwe re bikar bîne, ka bêje por gijikêêê, te ev av ji mala bavê xwe aniye ku tu nahêlî zarok bi avê bilîzin heee.

Heta danê êvarê dengê wan ji ber guhê me neçû. Dawiya dawî, me bûka xwe bi darê zorê anî malê û ji bûka cîranê me re jî behsa cîrantiyê kir, dûr û dirêj.

Piştî çend rojan bûka me û bûka cîranê me dîsa bûn hevalên hev, min qet tiştek ji wan fêm nekir. Dawiya dawî, ew ji zarektiya xwe de hevûdu nas dikin, şerê wan gelekî kevin û dirêj e. Lê bûka me serpêhatî ye, hertim kevirê wê di bin balgiyê wê de ye....

Xanzad: Yekem Koma Jinan a Rokê

Sozdar Koçer

Di demên dawî de gelek vîdeoyên heta niha nehatibûn parvekirin û di arşîva şexsan de bûn êdî bêhtir dikevin rojeva me. Em bi baldarî û kêfxweşiyek mezin li van vîdeoyên kevn dinêrin, weke ku valatiyek din a dîrok û çîroka me kurdan êdî bi van dîmenan tê dagirtin û delîlên wê jî hene. Herî dawî vîdeoya Ciwan Haco, Yilmaz Guney û hin navdarên din li konsereke Parîsê hate weşandin. Û niha jî vîdeoya koma rokê ya jinên kurd li Hewlêra başûrê Kurdistanê di medyaya civakî de belav dibe ango ji nû ve tê belavkirin ku êdî haya gelek kesan ji vê kom û çîroka komê çêdibe.

Dema meriv li vîdeoya wan a kevn dinêre, tê de çend jinên çeleng, bi cilên xwe yên kurdî û bi gîtara basê, akordeyonê û gelek enstrumanên dîtir,li ber xaniyekî kevirîn di nav gul û şênkahiyê de konserekê didin. Hejandin û heybeta wan ya di ber strangotinê de, di heman demê de meriv têdigihîje ku ev vîdeo di sala 1983'an de hatiye kişandin. Endamên komê xwerû jin in û şêwaza muzîka wan ya rokê ye, kêfxweşî û şaşwaziyek gelek mezin xwe li me dipêçe!

Heta niha dema em li terza rokê ya di zimanê kurdî de bifikriyana, her tim dîmenê çar mêran, tevî gitara wan ya basê û enstrumanên din dihat ber çavên me. Belê, Koma Wetan. Di bîra me de vîdeoya wan a bi dîmenên reş û spî ya 'Filîto Lawo / Şemê' maye.Yekem koma roka kurdî bi navê Koma Wetan – Koma Welat di sala 1973'yan de hat avakirin. Koma Wetan heta îro jî bi serkêşiya Kerem Gerdenzerî hîn jî tê naskirin û guhdarîkirin.

Bi tenê çend sal piştî Koma Wetan li başûrê Kurdistanê li Hewlêrê koma rokê ya yekem a jinên kurd bi navê Khanzad – Xanzad tê avakirin.

Dema meriv bixwaze ji bilî vîdeoya wan bêhtir li çîrok û agahiyên der barê komê de bigere, mixabin meriv ewqas pir çavkaniyan nabîne. Li gor çavkaniyan ez dikarim bêjim ku yekem car Savan Abdulrahman îsal nivîsek bi zimanê inglizî li ser danasîn û hevpeyvîna bi endamên kevn re parve kiriye. Meriv bi tenê di vê nivîsê de hinek agahiyên der barê komê de werdigire.

Li gor çavkaniyên heyî ev kom bi saya Wirya Ahmed hatiye avakirin ku teqez em wî tevî saza wî di gelek vîdeo, program û konserên qenalên cur bi cur de nas dikin. Ji Med Tv bigîre heta Stêrk Tv'yê. Wirya Ahmed di destpêka sala 1980'yî de li Hewlêrê Koma jinan daye avakirin, wî roleke gelek mezin di komkirin û perwerdekirina enstruman û stranbêjîyê de leyîstiye. Wirya Ahmed menajerê Koma Xanzad bûye û gelekî hewl daye ku jinan tevlî koma jinên Xanzad bike.

Di wê demsalê de helbet avakirina komeke jinan a muzîkê û hebûna wan a di festîval û konseran de ji aliyê civakê ve nedihate pejrandin. Koma Xanzadê di dema xwe de bi gelek zehmetiyan re rû bi rû maye. Lewre zexta civaka paşverû û baviksalarî li hemberî Xanzadê gelekî mezin bû. Digel wan nerazîbûn û neyîniyan jî wan xebatên xwe bi domdarî meşandin.

Piştî Koma Xanzadê bi giştî li Kurdistan û Iraqê bi nav û deng bû, êdî Rejima Baasê jî ji komê haydar bû. Di wê demê de şerê Iraq û Îranê rû dida. Rejima Baasê dixwest ku Koma Xanzadê ji bo propogandaya Rejimê stranên siyasî vebêje. Wan gelekî hewl da û zext li menajerê komê Wirya Ahmedî kirin, ku ji bo Rejimê kar bike. Wî ev pêşniyaz qebûl nekir.

Piştî zexta zêde ya Rejimê, menajerê komê neçar dimîne dev ji komê berde. Piştî çûyîna wî, koma Xanzadê mecbûr dimîne ji bo partiyên siyasî stranên propogandayê ango ji bo Rejima Seddam Huseyîn stranan vebêje. Zêde berdewam nake, koma jinan ji ber zext û rewşa awarte ya şer êdî belav dibe. Gelek ji wan jinan berê xwe didin Ewropayê û gelek ji wan jî li Kurdsitanê dimînin.

Ger ev kom belav nebûna, wê rê û xebatên wan ên salên piştre ji bo me tevan diyar bûna. Koma ji kurdan pêk hatibû dê mecbûr bimana ku ji kujerê xwe re stran bigotana û pesnê Seddam bidana. Xwesteka wan jî ev bû. Çi wahşetek!

Mixabin ev koma Jinan bû qurbaniya siyasta Rejima Baasê. Ji ber ku stranên wan bi fermî nehatin qeydkirin, ew bi tenê bi vîdeo û çîrokên xwe hene. Nifşê me yê nû divê xwedî li van çîrok û gavên dîrokî derkevin! Divê em têbigihijin ku beriya me gelekan rê ji me re vekiriye, divê em ji wê derê dest bi têkoşîn û meşa xwe bikin.

Çima navê Xanzad ?

Yek ji tiştên herî balkêş jî navê Komê ye. Jinan navê komê bi zanebûn hilbijartine û wisa xwedî li jinên jêhatî, çeleng û jixwebawer ên ku roleke gelek girîng di dîroka me kurdan de leyîstine, derdikevin.

Li gor çavkaniyan di dawiya sala 1600'î de Mîrîtiya Soran yek ji mîrgehên kurdan a li başûrê Kurdistanê bûye. Piştî şerê Çaldiranê Împaratoriya Osmanî qismekî mezin ê Kurdistanê dike bin serweriya xwe. Di vê demê de, Mîrîtiya Soran xwe li dijî xwestekên Osmaniyan bi hêz dikin û axa xwe fireh dikin. Di sala 1534'an de Împaratorê Osmaniyan Silêman dikeve ferqa mezinbûn û bandora vê herêma serbixwe û dikeve metirsiyekê. Ji bo ku Mîrîtiya Soran ji bo Împaratoriya Osmaniyan nebe pirsgirêk û li dijî wan dest bi berxwedanê neke, Osmanî Begê Soran Ezdînşêr qetil dikin. Piştî kuştina wî Mîrîtiya Soran dewrî Huseyîn Beg tê kirin. Kurê Mîr Huseyînê Soran Seyfedîn, dixwaze tolê hilîne û Mîrîtiya Soran dîsa ava bike. Ji bo vê yekê ew û Şahê Erdelanê xwe dikin yek û Mîrîtiya Soran ji Huseyîn Beg distînin. Demek dirêj şerê desteserkirina Mîrîtiya Soran berdewam dike. Gelek şer û kuştin çêdibin. Herî dawî di sala 1620'î de Mîr Silêman tevî xwişka xwe Xanzadê Mîrîtiya Soran bi rê ve dibe. Piştî Mîr Silêman tê kuştin Xanzadê weke yekem şaha Kurdistanê cihê birayê xwe digire û Mîrîtiya Soran êdî di bin hêza wê de ye. Tê gotin ku Xanzadê hêzeke ji 30.000 şervanî bi rê ve dibir û Mîrîtiya xwe ji Sefewiyan diparast. Serweriya wê ji Soran heta Herîrê berfireh bû. Ji bo Xanzadê kelehek hatibû avakirin ku nêzikî Hewlêrê ye, ev keleha bilind nîşaneya serwerî, hêz û parastina Mîrîtiya wê bû.

Cara yekem e ku jinek kurd bi çelengî, hêz û jîrbûna xwe welatek bi rê ve biriye. Dibe ku gelek kes çîroka Xanzadê nizanibin an jî bi tenê çîrokên jinên deh salên dawî yên parçeyên ku em lê dijîn bêhtir di hişê meriv de bin. Divê çîrokên din ên her parçeyên Kurdistanê jî wek mîrateya me tevan were dîtin.

Îro meriv bi tenê li başurê Kurdistanê kêm zêde çîroka wê dizane, gelek saziyên civakî, avahî, qadên vekirî, kom û rêxistinên jinan navê wê hildane, Koma Muzikê jî navê Xanzadê hildabû. Ji bo hemûyan jî Xanzadê nîşaneya berxwedan û tekoşîna Jina kurd e.

Kevneşopiya Çanda Danûkan

Şerwan Çîçek

Em dikarin bibêjin beriya şerê civakan û piştre destpêka desthilatdariyan her netew bi rengê xwe dijiya. Lê desthilatdaran bi tenê axa me talan nedikir. Yên jê re hewce bû bi xwe re dibirin yên mayî jî diguherand feslî xwe. Dixwestin em jî bi her awayî wekî wan bijîn û tevbigerin. Li gor hişmendiya wan pêşketina me texlîtkirina wan bû. Di destê wan de çek, rîm, tîr û pirtûkên xwestekan hebûn an em ê bibûna wekî wan an jî tune bibûna. Wêrektî, zanyarî, çandinî ji axa bê ser û binî, çemê li çar parçeyên welat bala desthilatdaran kişand. Ew ji bo xwe dikirin xaka pîroz a ku di 5 pirtûkan de wek bihûstê dihat pênasekirin, dest bi talan û wêranê kirin.

Lê gelê ku hebûna xwe ji axa xwe ya pîroz girtibe li hemberî her mêtingeriyê dertê û xwe diparêze. Kurd jî wek gelê herêmî di Rojhilatê Navîn de li hemberî mêtingeriyê li ber xwe didin. Bi çand, huner û folklora xwe, xwe li ser piya dihêlin û bicihanîna pîrozbahiyên xwe xwediyê rengê xwe ne.

Wekî her qewmî kevnoşopiyên kurdan jî hene. Her kurd di nav jiyanê de heta mirina xwe xwediyê çandeke xwezayî ye. Ji pêşiyên xwe heta niha çi girtibe di nûjeniya xwe de pê aram dibe û tevdigere. Bi stran, çîrok, govend û leyîstikên xwe, xwe didin nasîn û mîhrîcanan li dar dixin, xwediyê baweriyek kevnar û hunereke têr û tijî ne. Zarokên kurdan dema ji dayîk dibin; dabûna wan, diranderxistina wan, rêveçûna wan, daweta wan ku dimirin jî şîna wan tê kirin.

Zarok dema diran derdixin ji xeynî şîrê dayîkê êdî dikarin xwarina nerm bixwin. ev roj pîroz tê dîtin û ji aliyê dê, bav û malbata zarokan tê pîrozkirin.Dê û bav dema zarokên wan diran derdixin dest bi amadekariyên denûkê serê zarokên xwe dikin. Xwarinên xweş tên çêkirin, danûk tên kelandin, zarokên cîranan tên mala ku zarok diran derxistiye lê dicivin, dora wî/wê digirin. Pîra malê denûkê ji nokan, gûzan, behîvan, meşlûr, şekir û mewijan pêk tê li ser serê zarokan belav dike. Zarokên dorê denûka berhev dikin û dixwin. Pîra malê li zarok dinêre, li pêşiya zarok: şe, pirtûk, meqes, tizbîh, pênûs, kêr, çetel û hin tiştên din hene. Li gorî rîvayetê kî çi rake ew ê li ser wî emel bike. Heke şe rake ew ê bibe porbir, pirtûkê bigire ew ê bibe zanyar, alim, meqesê bigire ew ê bibe terzî, tizbîhê bigire ew ê bibe mele, pênûsê bigire ew ê bibe nivîskar an jî çîrokbêj, kêrê bigire ew ê bibe qesab, çetel bigire ew ê bibe xwarinpêj û hwd..

Dê û bavê zarokan di heman xwestekê de ne ku zarokên wan jiyana xwe aram derbas bikin û xweş bijîn...

Berxwedêr Mîkîs Theodorakîs

Aktivîst, siyasetmedar û bestekarê yewnanî Mîkîs Theodorakîs li Atînayê di 96 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe.

Hunermend Theodorakis ji bo filmê 'Vios Kai Politeia Alexi Zorba' yê ku dansa bi navê 'Sîrtakî' tê de hatibû lîstin, muzîk çêkiribû. Bi vê muzîkê Theodorakîs êdî dansa 'Sîrtakî' ya Yewnenistanê li cîhanê tê nasîn. Theodorakisê ku ji zaroktiya xwe ve bi muzîkê re têkildar bû ji bilî 'Zorba' ji bo fîlmên navdar ên wekî 'Z' (1969), 'Serpico' (1973) muzîk çêkiribû. Her wiha berhema wî ya ku li ser komkujiya cihuyan 'Balada Mathausen' bal dikişîne ser muzîka xwe.

Mîkîs Theodorakîs ligel nasnameya xwe ya hunermendiyê xwedî nasnameyeke polîtîk û berxwedêr e jî.

Mîkîs Theodorakis di dema şerê navxweyî yê Yewnanistanê de li dijî hişmendiya serdest û faşîzmê derdikeve. Ji ber vê yekê jî gelek caran tê girtin, sirgûnkirin. Ew di sala 1954'an de li Parisê bi cih bûbû lê di sala 1961'an de careke din vegeriyabû welatê xwe.

Di sala 1967'an de li diji 'Derbeya Albayan' derketibû. Ji ber vê yekê jî hatibû cezakirin. Bi kampanyayên navneteweyî cezayê wî yê hepsê tê betalkirin û wî sirgûn dikin. Di sala 1974'an de dema ku Cuntaya Albayan têk diçe ew dubare vedigere welatê xwe.

Piştî vegera welatê xwe Theodorakis di navbera salên 1981-1990'î de wek nûnerê Partiya Komunîst a Yewnanistanê tê hilbijartin.

Piştî koça wî ya dawî serokwezîrê Yewnenistanê Kiryakos Mîçotakîs ji bo Theodorakîs 3 rojan şîn danî. ***ATÎNA***

xwebûn

6-12 Îlon 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 90

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazışleri Müdürü: Elif Can Alkan
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

Keremê Qolaxasî

Keremê Qolaxasî şêrgeleyê ku dengbêjan stran avêtine ser. Rom û eceman li hev kirin û ew û hevalên wî kuştin

Ayhan Erkmen

"...
Lo Axayo weleh nabe bileh nabe
Îşev sê şev û sê roj in
şer ketiye ser milê Keremê Qolaxasî
Mêrekî çê tê kuştinê
Bi du gula birîndar e
Bi sonda mezin sond xwariye
Tê kuştinê lo bira jê venabe
..."

Rehma xwedê li dengbêjên nemir Reso, Şakiro, Huseyno, Ehmedê Bertî, Miradê Kinê û yên din be. Bûne bîra civaka me ya ku dîroka wê nehatiye nîvîsîn. Çend deh sal in bi rika neyaran û salan egîdiyên mêrxasên me yên sedsal in bi dengên wan deng vedide, didomînin.

Ji şêr û şepalan şêrgele dikevin. Keremê Qolaxasî jî ji wan Şêrgeleyan e ku dengbêjan stran avêtine ser. Hem Ehmed Begê bavê wî hem jî Cewê Xanima diya wî weke şêr û şepalan e. Ehmed Beg di dema xwe de giregirê eşîra Zirkiyan e û di alaya eşîrê de Qolaxasî ye. Cewê Xanima diya wî li dema serhildana 1925'an û piştî wê dema ku mêrên eşîrê qismek tên kuştin û qismek fîrar in, wek xwedawendekê, malbatê hildide bin per û baskên xwe, diparêze, nahêle jin û zar şerpeze bibin.

Keremê Qolaxasî di sala 1880'yî de li gundê Qiskaniya Qereyaziyê ji dayîk dibe. Dibistana seretayî li Xinûsê dixwîne, dûre li Erziromê îdadiyeyê dixwîne. Ji xwendinê zef hezdike girîngiyê dide xwendinê. Piştî mezin dibe li gundê Qiskaniyê dibistanê dide vekirin.

Mistefa Kemal dema di sala 1916'an de li Amedê dibe fermandarê Qolordiya 16'emîn, bi kurdan re têkîliyên xurt çêdike û bi propagandaya xwe ya 'ku em nebin yek welatê we dê bibe Ermenîstan' piştgiriyê ji kurdan dixwaze. Ev hesabê wî li hev tê, kurd jî herêmên Mûş û Bedlîsê ji rûsan şûnve digirin. Keremê Qolaxasî jî wê gavê li herema Gogsiyê li hember rûsan şerdike.

Rayedarên tirkan di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de her çiqas alîkariya wan jî kiribin hêzên alayên eşîrên kurdan ji bo pêşeroja xwe wek xetere dibînin. Zanin aramî dest pê bike ev hêz wê serên wan biêşînin û alayên eşîran belav dikin û dixwazin çekên wan jî berhev bikin. Keremê Qolaxasî bertek nîşan dide, çeka xwe radestî wan nake; dixwazin wî bigirin ew jî çendekî fîrar digere, xwe nade dest.

Xalit Begê Cibrî, Yusuf Ziya Beg wan dema ku di bin serweriya Xalit Begê Cibrî de bi giregirên kurdan re tevgera azadiyê ava dikin, Keremê Qolaxasî jî di nav de cih digire.

Pir nakişîne xebera devletê jê çêdibe ewilîn Yusuf Zîya Beg digirin. Çil roj piştî wî mifreze leşker tên mala Xalit Begê Cibrî ya li Erziromê, qaşo yê ji bo karekî leşkeriyê wek peywirdar here Sariqamişê wî digirin û di ser Panosê re berê wî didin Bedlîsê.

Xalit Begê Hesenî, Keremê Qolaxasî û Ferzende Beg amadekariyê dikin ku wî xelas bikin. Lê mixabin dereng dimînin. Pir nakişîne der barê Keremê Qolaxasî, Xalit Begê Hesenî û Şêx Seîd de jî biryara girtinê dertê. Şêx Seîd ji Xinûsê dertê.

Leşker ji bo Keremê Qolaxasî bigirin diavêjin ser gundê Qiskaniyê lê Keremê Qolaxasî xwe nade dest, ji gund dertê bi tevî yekîneya xwe diçe digihîje Xalit Begê Hesenî.

Şêx Seîd di 4'ê çileya 1924'an de li Qirikanê bi sê sed kesî re civîna xwe ya ewilî li dar dixe. Beşdarvan du rojan nîqaşên dîrokî dikin û biryarên girîng digirin. Ji wê şûndatir êdî Şêx Seîd serokê tevgerê ye. Li gorî biryarên hatine girtin her kes bi ber xwe ve, di herêmên xwe de rêxistinên xwe ava bikin. Şêx Elî Riza, Xalit Begê Hesenî û Keremê Qolaxasî jî dê berpirsyariya herêma Serhedê bikin.

Li gorî salixdayînan, dema ku Şêx Seîd ji Qirikanê vediqete, li Ezîzanê di mala Sehdînê Telhê de der barê revandin û xelaskirina Xalit Begê Cibrî de bi Şêx Elî Riza, Keremê Qolaxasî, Kamil Beg û Mehemed axa re nîqaşan dike. Biryarê digirin ku yê Selim û Ehmed Begên birayên Xalit Begê jî bitanişin û ji bêderfetiya zivistanê dê benda biharê bimînin.

Lê di 13'ê sibatê de li Pîranê bi provakasyona leşkeran serhildan bê wext dest pê dike. Hemû endamên Tevgera Azadiyê ji cihê lê ne dikevin nav liv û tevgerê. Şêx Elî Riza, Xalid Begê Hesenî, Keremê Qolaxasî jî li herêma Xinûs û Milazgirê şerekî dijwar dimeşînin. Lê belê dema ku Şêx Seîd ji Amedê vedikişe ya wan jî ji per û baskên wan dişikê. Biryara derbasbûna Rojhilat digirin; Şêx Elî Riza, Xalit Begê Hesenî, Keremê Qolaxasî, Ferzende Beg, Bavê wî Silêmanê Ehmed bi jin û zar û zêç sed û pêncî kes derdikevin rê.

Leşkerên romê li dû wan in, hin eşîrên hevkarên romiyan jî bi wan re şer dikin. Bi rojan li Çiyayê Tenduregê asê dimînin. Xwarina wan xelas dibe. Ji bo hespan serjê bikin ji Şêx Elî Riza îcazetê digirin. Li du xwe kuştiyan dihêlin û ji

sînor derbas dibin lê li wî aliyê sînor jî leşkerên eceman pêşî li wan dibire.

Ji ber ku herdu dewletan li hev kirine. Leşkerên eceman sîlahên wan ji wan dixwazin, şervanên kurd vê ji xwe re heqaret dibînin û napejirînin, giregira tomotîk û makîneyan dest pê dike, Keremê Qolaxasî, Evdalê Pismamê wî, Silêmanê Ehmed, Şêx Diyadîn û nêzî çil kesî tên kuştin.Wan li Kîlîsekenta Makuyê dispêrin axê.

Nîşe: Kesên ku di wêneyê de: Yên runiştî û qamçî li ser çokan Keremê Qolaxasî û yên li rex Faîqê Evdo, yên pê û rastê Ehmedê Orê û Dengbêj Huseyin

Li navçeya Çermûgê parçeyek ji bihuştê: Şirava Şêxan

Serdar Altan

Xwezaya Kurdistanê dîsa bang dike. Mirovahiyê ber bi xwe ve dikişîne. Ev welatê ku bi xweza û dîroka xwe di dilê Mezopotamyayê de dijî ji destpêka mirovahiyê heya niha ji gelek şaristaniyan re wargehî kiriye. Bi serborî û xwezaya xwe ya dewlemend bûye dergûşa çandê.

Kurdistan bi taybet ji hêla xwezayê ve xweş e. Hûn berê xwe bidin kijan alî dê xweşikbûneke xwezayî derbikeve pêşberî we. Her yekê wan ji hevdu xweşiktir ji hevdu taybetir in...

Yek ji navçeyên xweş û xwedî xwezayek dewlemend a Amedê navçeya Çêrmûgê ye. Ev navçe ji gelek aliyan ve reng û rûyê xwezayê bi mirov re parve dike.

Lê dema mirov behsa navçeya Çêrmûgê dike di serî de şiravên wê yên xwezayî tên bîra mirov. Werin em yek ji van şiravan, Şirava Şêxan nas bikin.

Şirav ango şelaleya Şêxan li Çêrmûgê ye ku bi germavên xwe navdar e. Ev cihê parçeyek ji bihuştê, yek ji wan şiravên herî xweş a vê navçeyê ye.

Ji ber ku li cihek asê, di nav kendal û zinaran de ye, zêde kes pê nizane. Lê belê van salên dawî piştî xweşiya wê hate keşifkirin, hêdî hêdî şêniyên navçeyê û kesên ji derve tên herêmê diçin ziyareta vê şiravê.

Ji ber ku navçeya Çêrmûgê cih û warê germavan e, her sal bi hezaran turîst diçin vê herêmê.

Mirov dikare bêje turîstên diçin navçeyê, dixwazin vê xwezaya bedew jî bibînin.

Şirava Şêxan di nav teht û zinaran de rê li xwe vekiriye û ber bi golavekê ve xwe berdide xwarê. Aveke spî û gur, bi dengekî ku mirov ji xwe dibe diherike û dîmenên gelek xweş derdixe holê.

Derdora şiravê; hem teht û zinar in, hem dar û ber û hêşinahi ye. Darên li derdora vê ava zelal darên kevnar û mezin in. Siya daran li ser golavê wek çadirek xwe kubandiye. Tîrêjên rojê di nav şaxên daran re rûyê xwe nîşanê ava heyatê dide.

Ava ku diherike, bi nazdarî û bi aheng xwe li rûyê tehtan dide û ber bi jêr ve xwe berdide. Dema herikîna wê, hênkayiya avê li rûyê mirov dide, xweşiyek cuda dixe nav dil û hinavên mirov.

Ger tu ji jor de lê binêrî, şirav wek kaniya ji bihuştê xuya dike. Golava ku ji ber herikîna avê çêbûye wek hewza xwedawenda ye. Mirov dikare bi saetan li vê xweşiyê temaşe bike. Dema mirov bi bêdengiyek kûr lê temaşe dike, dengê avê dikeve gohê mirov. Ew deng diçe heta nava dilan û mirov pê mest dibe. Ew deng dibe weke helbestekê... Helbestek ku nû hatiye bihîstin.

Dem payîz e... Êdî dar hêdî hêdî pelên xwe diweşînin. Lê belê xweşiya vê şiravê hêj wenda nebûye. Hê jî wek biharê bi dilxweşî diherike, hê jî weke hênkahiya biharê rengîn e xwezaya vê erdnîgariyê.

Ava ku ji şirava Şêxan û ji şiravên din diherikin her wiha jînê didin derdora xwe. Xwezaya herêmê bi vê avê geş dibe, dewlemend dibe. Dar û ber, kulîlk û nebat bi hebûna vê avê şîn dibin.

Her wiha jiyana mirovan jî xweş dike ava şiravê. Bi hezaran şêniyên herêmê wek çavkaniya ava vexwarinê jî avê ji şiravê digirin. Em dikarin bêjin ku ev ava pîroz nebe, tevahî zindiyên vê xwezayê wê bê av bimînin. Ev yek jî pîrozî û girîngiya vê avê careke din radixe ber çavan. Hem xweza hem jî zindiyên di nav xwezayê de şikirdarê vê ava pîroz in.

Ev demek e ji bo ev devara xweş were parastin hewldan hene. Tê gotin ku herêma ku şirav lê ye ji bo bibe parqa xwezayî li ser xezînê hatiye tescîlkirin. Her wiha ji bo çêkirina parqa xwezayî projeyek jî hatiya amadekirin.

Niha ev xwezaya bedew li benda keşifkirinê ye. Pêwist e bêtir kes vê devera parçeyek ji bihûştê nas bike û were vî diyarê xweş bibîne. Ji bo vê jî lazim e ku ekolojîst û rayedarên herêmê xebatên li ser danasîna vî cihê pîroz xurtir bikin.

Çendîn mirov ber bi xwezayê ve diçe, xweza jî rengîniya xwe pêşkêşî mirovahiyê dike. Xweza bi hebûna xwe xweşiyê diafirîne. Ev şirava li navçeya Çêrmûgê jî rengek cuda yê vê xwezayê ye. Ger derfeta we hebe, pêwist e hûn werin û vê bedewiya şirava Şêxan bibînin û rojek xweş lê derbas bikin.